Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1379 | 24-Gulan-2026 | www.ronahi.net/ku/

**Navnîşan**
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# Sê amûrên kevneşopî ku bi destê dayikan dihatin afirandin

**Aylîn Ehmed/ Qamişlo**

**Di serdemên borî de wekî hewcedariyekê ji bo malan dayikên Kurd amûrên wekî teşî, destar û cere diafirandin, ev amûr dibûn perçeyekî girîng ji jiyana wan. Di heman demê de di çanda kurdewarî de jî bûn nasname û xwedî cihekî girîng.**



Amûrên kevneşopî yên jiyanî yên dema berê bingeha nasname, çand û jiyana civakan dihat dîtin. Ew ne tenê bîranînên rabirdûyê ne, lê belê amûrên zindî ne ku di demên borî de jiyana civakê hêsantir dikir.

**Teşî: Derbasbûna demê û hûnandina qederê**

Teşî amûreke darîn a piçûk e ku ji bo gogkirin û çêkirina rîs ji hiriya mihan an jî bizinan dihate bikaranîn. Dayikan bi vê amûrê kinc, xalîçe û tûrik çêdikirin. Dema ku dayikan hiriya pez bi destê xwe dişûştin, vedikirin û bi şehê hirî dişikinîn, êdî li dor destên xwe yên çepê dipêçan, piştire serekî ji wê hiryê dikişandin, hinekî bi tiliyên şil daziran-din û bi serê teşiyê ve girê didan. Êdî dema ku dixwestin, ji wê teşiyê tişt bi destên xwe çêdikirin.
Teşî li ba dayikan pir girîng bû ku bi teşiyê pir tiştên malbatî çêdikirin. Da-yikan teşî ne tenê li malê çêdikirin, lê dema li pez dinerîn, diçûn zozanan, an jî diçûn serdana cîranan bi xwe re dibirin û çêdikirin. Di çîrokên Kurdî de, her zivirandineke teşiyê wekî borîna demê û hunandina qederê tê dîtin. Dengê zivirîna teşiyê di şevên zivistanê de mîna muzîkeke aramker bû ku zarok pê radizan.

**Destar: Bereketa nanê male**

Destar aşê piçûk ê malê bû. Ew ji du kevirên girover û giran yên li ser hev hatî danîn pêk dihat ku ji bo hêrandina genim, nîsk û ceh û gelek tişên din dihat bikaranîn.
Di jora destar de qulikek hebû. Dayikan bi destekî xwe genim an jî nîsk hindik-hindik diavêt wê qulê û bi destê din jî bi rêya darikekî kevirê jorîn bi hêz li dor xwe dizivirand. Piştire di navbera her du keviran de genim dipelixî û ji dorên kevir ve dirijiya. Destar li ser kofiyekê an li ser xalîçeyekê dihat danîn da ku tiştên dihêrin birijin ser.
Tê dîtin ku bikaranîna destar karekî pir giran bû û hêza destan dixwest. Ji ber vê yekê, piranî du jinan bi hev re destar dizivirandin ji ber giraniya kevir. Ji bo ku di dema vî karî de westandina xwe ji bîr bikin, dayikan bê navber stranên destarî digotin. Ev stran piranî li ser zehmetiyên jiyanê, hesreta xeribiyê an evîna dilê wan bûn. Destar di mal de bereketa nanê malê bû.

**Cer: perçeyek girîng ji çanda kevnar ku herî zêde dihat bikaranîn**

Cer, firaxên navîn an jî piçûk bûn ku bi giranî ji bo sarkirin û veguhastina avê an jî ji bo hilanîna penêr, rûn û tirşiyan di dema berê de dihatin bikaranîn. Cer bi tevahî ji heriya siruştî û bi destan dihatin çêkirin. Ev huner parçeyekî giring ji çanda kevnar a herêmê bû.
Kesên wê serdemê dema dema ku dixwestin cerekî çêbikin, axa sor an axa spî ya taybet ji rûbar an axa çeman tanîn û piştire ew ax ji kevir û giya paqij dikirin û ax bi avê re strandin da ku bibe heriyeke nerm û tîr. Ji bo ku cer di dema pijandinê de neteqe, hinek kayê hûr an qûma zirav tevlî dikirin. Dema ku çêkirina wê heriyê bidawî dikirin paşê datanîn li ser çerxa sifalgeriyê da ku bi awayekî bilez bizivire û wê cera ku dixwestin çêbikin.
Di birêveçûna demê re
Amûrên bikaranînê yên weke cer, destar û teşî weke hewcedariyekê di dema berê de dihatin bikaranîn, ji ber di wê demê de tiştek nedihat afrandin dayikan bi destê xwe ev kar dikirin, da ku debara jiyana xwe bi wan bi-kin. Lê piştî bi demê re her tişt hat afrandin, êdî mirov nema ew amûrên kevneşopiyên jiyanî zêde bikar anîn. Di dema niha de milet wan amûran ji malên xwe re weke xweşikbûnekê datînin, ku êdî ev kevneşopî di çanda kurdan de pir bipêşket.

**Bi Kamîreya Narama Mihemed**



**Gotina Dawî**



Mihemed Seydi

## Kirîzên mezintir li pêşiya Sûriyan e!

Li Sûriyê, ji aloziya siyasî û ewlehiyê zêdetir, rewşa aborî mirov fetisandine. Rojane dîmen derdikevin holê ku mirov parsê dikin, ji nava çopê xwarinê kom dikin û gelek ji wan jî birçî dimînin. Kar tune ku bikin û gelek kes jî di bin navê ku di serdema Baas de karmendbûne ji kar tên durxistin. Desthilata HTŞ'ê bi zilamên rêjîmê yên mezin re peymanan çêdike û li hev tê, mirovên karmend yên ku ji bo debata xwe bikin jî di nava saziyan de bûn, tên hedefgirtin. Wekî ku dibêjin; bi yên mezin nikarin, radibin kerba xwe di serê yê bi çûk de derdixin. Mirovên Sûrî yên ku êdî nizanin berê xwe bidin kê û kû, tu kes li nava dest-hilata heyî de xema wan naxwe û plana xwe li gorî xwe dantînin. Dîsa li gorî hin agahiyan, desthilata HTŞ'ê ji roja ku serweriya xwe pêk aniye, bi milyonan dolar bi rengekî qaçax derxistine derveyî welat û bi taybet jî Qubrisê. Vê agahiyê zêde kes belav nake, ji ber hemû di nava pêkanînên berjiwendiyên xwe de bi rengekî ji rengan hevkarê vê gendeliyê ne. Herwiha ji bo ev mijarên gendeliyê nekevin rojevê, desthilata HTŞ'ê bi desteka dezgehên ragihandinê yên Kendavê û Tîktokeran, carê mijarekê dixin rojevê ku xelkê Sûriyê pê re mijûl bikin da qale rewşa jiyanê ya pir xerab nekin. Di dema ku Sûrî li Şamê derketin qadan û gotin ew dixwazin bi rûmet jiyan bikin û nanekî bixun, desthilata heyî derket şanoyek çê kir û di vê şanoyê de qaşo yê ku komkujiyan Tedamûnê yê Şamê pêk aniye ku bi navê Emced Osman e gitine û paşê jî çend zilamên rêjîmê yên din xistin rojevê û bi vî awayî li ser dengê xelkê girtin. Dîsa dema ku qale revandina Jinên Elewî hat kirin û ket rojevê, kesa bi navê Betul ya Elewî derxistin ser ekranê ku ew jî ji aliyê komên çekdar ên HTŞ'ê ve hatibû revandin, ku tê de dibêjin ev kes nehatiye revandin, lê belê ew bi xwe ji malê reviyaye û bûye Sûnî ango bûye DAIŞ'î. Di dîmenên derxistina Betûl de jî xuya dikir ku ev kes di bin gefekê de ye û li ser wê yekê jî Dayîk û Bavê wê jî derketin û gotin ku ew dixwazin keçka xwe bibînin.
Li alyê din, di hefteya derbasbûyî de, dîmen belav bûn ku li bajarê Reqayê çawa goristana Şehîdên li dijî DAIŞ'ê yên QSD'ê hatiye wêrankirin. Kesên li wir jî Mermer û Kevirên vê goristanê jî dizîne û hemû tev de tarûmar kirine. Dîsa li herêmên ku berê Rêveberiya Xweser jî lê bû, bêkarî zêdetir bûye û gelek kesên ku berê pere digirtin, niha ew jî bê miaş mane û rewşa wan gelekî xirab bûye. Di heman demê de, cotkarên ku Genim û Ceh çandibûn û li benda berhemên xwe bûn da bifroşin, ji ber nirxê kirîna wê pir kêm hatiye diyarki-rin, ew jî bi gazinin û li gelek cihan meş jî li dar xistin û nerazîbûna xwe diyar kirin.
Di dawiyê de dixwazim bibêjim ku ev hin bûyerên ku me li jorê rêz kirin, eş-kere dike ku di rojên pêş de ew ê kirîzên civakî yên gelekî xirab derbikevin holê û bi taybet jî deverên ku berê Rêveberiya Xweser lê bû û bi nebûna wê valahiyeke mezin çêbû. Her wiha bêkarî jî wê bihêle ku gelek mirov berê xwe bidin kuştin û dizî û talankirinê. Lewma li her cihî divê mirov li ser jiyana xwe hişyar bin, ji ber rewş ber bi neyînîyê ve diçe û pêşeroj nexuyaye. Ji bo vê jî divê nûnerên Kurd û berpirs, erka xwe ya li hember Kurdan bi berpirsyarî bi cih bînin û ji bo kont-rolkirina kirîzan bi sistî nêz nebin.

**Sudoku:Pirs 76**

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 3 | | | | | | | 6 |
| 9 | | | | | 2 | | 7 | 3 |
| 1 | 6 | | | 9 | | 5 | | |
| | | 9 | 4 | | 5 | | 6 | |
| | | 1 | | | | 4 | | |
| | 5 | | 7 | | 1 | 8 | | |
| | | 2 | | 3 | | | 9 | 4 |
| 5 | 9 | | 1 | | | | | 2 |
| 4 | | | | | | | 1 | |

**Sudoku: Bersiv 75**

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 8 | 1 | 9 | 2 | 6 | 5 | 3 | 4 | 7 |
| 2 | 7 | 4 | 9 | 8 | 3 | 1 | 6 | 5 |
| 5 | 3 | 6 | 1 | 4 | 7 | 9 | 2 | 8 |
| 1 | 9 | 8 | 6 | 2 | 4 | 5 | 7 | 3 |
| 4 | 5 | 7 | 3 | 1 | 9 | 6 | 8 | 2 |
| 6 | 2 | 3 | 7 | 5 | 8 | 4 | 9 | 1 |
| 3 | 6 | 2 | 4 | 7 | 1 | 8 | 5 | 9 |
| 9 | 4 | 5 | 8 | 3 | 2 | 7 | 1 | 6 |
| 7 | 8 | 1 | 5 | 9 | 6 | 2 | 3 | 4 |

## Hişmendî û yekîtî rêya parastina ji Şerê Taybet e



Şerê Taybet di roja îro de bi rêya medyayê, torên civakî û propagandayê zêdetir tê bikaranîn. Belavkirina derewan, tirs û bêhêvîtî di nav civakê de pêktîne, mirovan ji çand, ziman û nirxên wan dûr dixe. Hêzên sermeyedar û dewletên desthilatdar bi van rêbazan raya giştî kontrol dikin. Gelê Kurd jî di hedefa vê şerî de ye, lê hişmendî û yekîtî rêya parastinê ye.**R-4**

## Bi nêzîkbûna Cejna Qurbanê tevger li bazara bajarê Qamişlo lawaz e



Tevî nêzîkbûna Cejna Qurbanê jî, tevgera welatiyan di nava bazara bajarê Qamişlo de li gorî salên borî kêm e. Firoşkarên bazarê jî diyar kirin ku ji buhaya zêde asta kirînê pir lawaz e.**R-8**

## Vayrûsa Ebola: Belavbûn, sedem û xweparastin



Vayrûsa Ebola di Adara 2014'an de li Rojavayê Afrîqayê dest pê kir û wekî mezintirîn pandamiya xwînçûna vayrûsî di dîrokê de tê dîtin.**R-7**

## Di nava lîstokên modernîteyê de, rola rêxistin û tevgerên jin li ku ye?

Bikaranîna jin di hemû aliyên jiyanê de bêyî ku weke kiryarek bê dîtin, sûc e. Berpirsyarê vê sûcê jî rêxistinên navneteweyî yên jin in ku bêdeng in. Rêxistin û tevgerên jin yên navneteweyî, da ku bi hişê zilamperest tevnegerin, divê rastiya xwe di asta yekemîn de nas bikin û rastiya pergalê bizanibin.**R-2**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1379 | 24-Gulan-2026 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# 'DEMOKRASÎ PÊK NEYÊ WÊ KIRÎZ KÛRTIR BIBIN'

Endama Ofîsa Têkiliyên PYD'ê Îlham Mihemed û Sekreterê Partiya Roj a Demokratîk a Kurd li Sûriyê Kovan Keno diyar kirin ku ji ber pêşxistina siyaseta navendî li hemberî demokrasiyê, heya roja îro pirsgirêkên mirovan çareser nabin. Demokrasî pêk neyê, wê pirsgirêk bidomin, kirîz kûrtir bibin û şerên nû derkevin.**R-5**




## Amerîka û Çînê; Têkilî û nakokî

Pêwendiyên di navbera DYA û Çînê de di gelek qonaxan re derbas bûne, di navbera hevkarî û dijatiyê de bi şêwazên cuda têkilî hatine guhertin. Ji bazirganiyê heta teknolojî û siyaseta navneteweyî her du welat ji bo serweriya cîhanê di nava pêşbaziyeke giran de ne.**R-6**



## Îran li şûna pênûsan, çekan dide zarokan!

Ji destpêka êrişên DYA-Îsraîl li ser Îranê, siyaseta biçekirina sivîlan û bi taybet zarokan ji hêla rêjîma Îranê ve tê ferzkirin. Bi vî rengî Îran zarokan dûrî zanîn û perwerdeyê dixe û ji bo berjewendiyên xwe yên stratejîk zarokan fêrî çekan dike.**R-3**




Avakirina jiyaneke azad bi rêya etîk û estetîkê — Îsyan Karadeniz R-2


Dema Ragihandin Bibe Amûreke Siyasetê, Xiyanetê Li Heqîqetê Dike — Idrîs Henan R-4


Cejna Heciyan û pirsgirêka qurbanan — Hafiz Ahmet Turhalli R-7


Berhevkirina zargotinê — Remezan Olçen R-9

# Di nava lîstokên moderniteyê de, rola rêxistin û tevgerên jin li ku ye?

**Esma Mistefa**




Di serdema heyî de ku her tişt bi rêveçûn û pêşketinên moderniteyê re her wiha bi herikîna teknolojiyê re diçe, cîhan bûye cihê mijûlkirinê. Ev mijûlbûn çiqas têrker û sûdmend e, ew li gor kesên ku bingeha jiyana xwe hilbijartine ye. Ger em bixwazin xwe di aliyên jiyanî, civak, mirovî, siyasî, gerdûnî û hwd… de pêş bixin, wê ew tercîha me ya şexsî be û li gorî asta me ya hişmendî ku em çiqas dixwazin xwe ji xefka moderniteyê dûr bixînin û xwe di gola mijûlkirina valahiyan de, nefetisînine. Di serdemeke ku ev pêşketinên piralî tê de têne kirin, pergala sermeyadar a ku bi mirovahiyê dilîze, bê guman hebûna jin, ji bîr nekiriye.

Pergaleke ku di dîroka xwe de xwe li ser tunebûna rola jin û bikaranîna wê li gorî hebûn û berjewendiyên xwe, saz kiriye, wê helbet di rêveçûn û pêşketinên serdemî de, gav ji ev erka xwe ya dîrokî bernede. Em çima van tiştan dibêjin? Ji ber ku ger di di sedsala 21'emîn de em dibin şahidê hewildanên ji holêrakirina rola jin, pêkanîna kiryaran li ser beden û cewherê wê, ji xwendin û zanînê dûrxistin ku hîn li Efganistanê qedexekirina xwendina keçên biçûk xwe nû dike, her wiha li meydanên şer û pevçûnan dengê jin tê qutkirin û tepeserkirin, ger di cîhanê de di sala 2025'an de zêdeyî 800 û 40 milyon jin rastî şideta fîzîkî, cinsî û şideta dîjîtal hatine, wê demê hebûna Rêxistinên Parastina Mafê Mirovan li ku derê rol dilîze? Rola sazî û parastina mefê jinan di cîhanê de li ku ye? Divê em balê bikşînin ser.

Sîstem ne tenê dixwaze mafê jin ango hebûna jin weke fîzîkî ji holê rake, ji xwe nikare wiha bike ji ber ku ew berjewendiyên xwe li ser esasê hebûna wê dide meşandin. Plana moderniteya kapîtalîst, pergala sermaye û feraseta cinsperet; dixwazin rol û cewherê jinê di cîhanê de vala derxînin. Yanî hişmendiya jin, cewherê jin, fikir û tevgera bi mejiyê jinê, nirx û pîvanên jinan, ji holê rakin. Weke opjeyekê li ser rûyê erdê bihêlin ku ji hemû xwebûnên xwe mucerred be yanî xwerû be, wiha dixwazin karekterekî jin di cîhanê de bidin avakirin.

Ev ne tenê hişmendiyeke ku di hin welatan de tê kirin, lê belê ev zihniyeteke sîstamatêk e û di giştî şaneyên pergalê û zihniyeta dewletê de, xwebirêxistin kiriye û tê mezinkirin. Ji bo pêkanîna vê yekê, ji destê hêzên cîhanê di aliyê bîrdozî de çi tê kirin, dikin. Avakirina jineke ne ayidî xwe, armanca wan a yekem e. Li gorî vê yekê tevgerandin, plan û hişê xwe ya bi deh salan li pêş e, dixebitînin. Pergal hewla (Em ê çawa jineke ku xwe nas neke! ava bikin û îqna bikin) dike.

Li derdora hêz û îradeya jinê di her alî de şerekî zirav û înce tê meşandin. Ji sîstemên perwerdehiyê yên dibistan û zanîngehan bigre heyanî zagon û yasayên jin di destûr û dewletan de. Bi her awayî hewla qelskirina jin tê kirin. Em jî di ferqa vê yekê de ne.

Ji bo ku jin girîngiya xwe nas bike, divê dîroka xwe lêkolên bike û rastiya xwe di pelên dîrokê de bibîne, ne di çavên pergala heyî de. Ji ber ku piratîka ku pergal niha dimeşîne ew jî vedigere beriya hezar salên ku yekemîn gavên xapandinê li ser jin hatine pêk anîn, tê. Ger em îro ketine ferqa wê, divê jin ji antîasîmîlasyonê xwe biparêzin. Cewherê xwe vala dernexin, vegerin rastiya xwe û li hember van piratîk û zihniyetên sîstamatîk têkoşîn bikin.

Gelo di cîhaneke ku ewqas tê de siyaset, polîtîk, pratîk û plan li ser jin tên meşandin, wê demê rêxistinên parastina mafê jin yên ku di seranserî cîhanê de hatine avakirin, rola wan li ku ye û çi dikin? Çima di serdema heyî de nikarin hişmendiya jin li hember van rastiyan pêş bixînin û planên sîstemê vala derxînin. Ma parastina mafê jin, tenê tesbîtkirina kiriyaran û derxistina bîrancoyan e? Tenê di blatform û civînên navneyewî de, ewqas jin li herêmên şer û pevçûn hatine kuştin û revandin. Eqwas jin bûne qurbaniyên tundûtûjiyê û hwd..?

Helbet ev tenê ne erka wan e, lê belê ger ev tevger bi destê hêzên pergalê hatibin avakirin û ev jin li ser zihniyeta wan hatibin perwerdekirin, wê demê wê encam jî ne têrker be. Di asta yekemîn de em ê li gor hiş û siyaseta van hişmendiyan tevnegerin, divê rêxistinên parastina mafên jin di asta navneteweyî de, heydarê Şerê Taybet be.

Bikaranîna jin di hemû aliyên jiyanê de bêyî ku weke kiryarek bê dîtin, sûc e. Berpirsyarê vê sûcê jî rêxistinên navneteweyî yên jin in ku bêdeng in. Erka rêxistinên mafên jin, tevgerên jin û feminist, ne ku li dijî bedena mêr şer bikin e û kiryarên li ser jin eşkere bikin e, erka wan xwendina mejiyê dewletê, jiholêrakirina feraseta bikaranîna jin û bidawîanîna van pilanên zirav e.

Divê em viya bizanibin, tevgerên parastina mafên jin di cîhanê de bi giştî rola wan qels e û bi erkên xwe yên bingehîn ranabin. Li hember wê gelek rêxistin û tevgerên parastina jin hene ku dizanin erk û misyona wan çi ne. Ji wan tevgeran jî; Rêxistin û tevgerên jin yên ku di bin siya Tevgera Azadiya Kurdistan de hatine avakirin. Feylesofê demê Rêber Abdullah Ocalan di nirxandin û diyarkirina erka jin di cîhanê de, bi hezaran nivîs û pirtûk raxistine ber destên me. Dîroka jin a ku hatiye lêkolînkirin, ne lêkolîneke ji rêzê ye, ev lêkolîn û tesbîtên dîrokî ne ku tenê ji aliyê Rêber Abdullah Ocalan ve hatine kirin.

Rêxistin û tevgerên jin yên navneteweyî, da ku bi hişê zilamperest tevnegerin, divê rastiya xwe di asta yekemîn de nas bikin û rastiya pergalê bizanibin.

Me xwest di vê analîza xwe de balê bikşînin ser rastî, siyaset û planên ku li ser jin di cîhanê de têne meşandin, bi taybet rollîstina rêxistin û tevgerên jin li hember van nêzîkatiyan çi ye. Di dawiyê de me xwest em pêlên ku tevgerên jin tê de hatine avakirin bînin ser ziman.

Tevgerên jin yên cîhanê

Tevgerên femînîst rêzeçalakiyên civakî, siyasî û aborî ne ku armanca wan wekheviya zayendî pêk bînin, her wiha cudakarî û tundûtûjiya li dijî jinan di hemû waran de ji holê rakin. Ew bi rêya çar pêlên sereke pêşketiye ku bi daxwaza mafên dengdanê di sedsala 19'an de dest pê kiriye û bi karanîna medyaya dîjîtal ji bo hêzkirina jin û şerê li dijî tundûtûjiyê gihîştiye lûtkeyê.

Dîrok û taybetmendiyên sereke yên tevgerên femînîst:

- Pêla yekem (dawiya sedsala 18'an - destpêka sedsala 20'an): Balkişand ser mafên yasayî û siyasî, bi taybetî mafê dengdanê û hemwelatîbûnê.
- Pêla duyem (salên 1960-1980): Balkişand ser azadiya jinan, wekheviya li cihê kar, mafên zayînê û şîdeta navmalî.
- Pêla sêyem (salên 1990'an): Tekezî li ser pirrengî, yekparçeyiyê (yekperçeyiya zayendî bi nijad û çînê re), û takekesiyê kir.
- Pêla çaremîn (niha): Teknolojiyê û medyaya dîjîtal bikar tîne, da ku jinan bihêz bike û li dijî tacîz û şîdeta li ser bingeha zayendî şer bike.

Cûrbecûrîya tevger û meylên femînîst ên herêmî:

Femînîzma lîberal: Bi rêya reformên qanûnî balê dikişîne ser wekheviyê.

Femînîzma radîkal: Hewl dide ku tevahiya avahiya civaka baviksalar biguherîne.

Femînîzma Îslamî: Di salên 1990'î de derketiye holê û armanc dike ku edaletê ji bo jinan bike, her wiha edalet û wekheviyê li ser bingeha referansek Îslamî û xwendinên nûkirî yên Quran û Sunnetê bicîh bîne.

Femînîzm li herêma Ereban: Tevgerên nû ne ku di çarçoveya nakokî û şoreşan de çalakiyên xwe ji bo pêşxistina mafên mirovan û siyasî zêde kirine.

Akademiya Jîneolojî

## Avakirina jiyaneke azad bi rêya etîk û estetîkê

**İsyan Karadeniz**

Yek ji krîzên ku îro herî zêde tê nîqaşkirin windakirina wate û heqîqetê ye. Ev windakirin ne tenê pirsgirêkek takekesî ye; ew şikestinek kûr a ku aliyên xwe yên civakî, ekolojîk û çandî hene. Di serdema nûjen de, ferzkirina pergala serdestiya mêran û pergala kapîtalîst wekî yekane rastiya derbasdar bûye sedema zirarên cidî di hemî warên jiyanê de. Ev zirar gihîştiye wê astê ku îstismara xwezayê, civakê û bi taybetî jinan ji bo berdewamiya pergalê hema hema pêwîst bûye. Lêbelê, di jiyanek ku civakîbûn xurt e, nêzîkatiyek ekolojîk serdest e, û rizgariya jinan tê misoger kirin, bingeha hebûna van pergalên îstismarkar winda dibe. Ji ber vê yekê, nîqaşên li ser etik û estetîkê ne tenê naveroka felsefî lê di heman demê de naveroka siyasî û civakî jî hildigirin. Mirov ne tenê hebûnên biyolojîk in. Ew di heman demê de xwedî lêgerîne ku jiyana xwe watedar, baş û xweşik bikin. Lêbelê, îro, nebaşî û xerabiya jiyanê ne tenê mirovan, lê hemî zindiyan û gerstêrkê tehdît dike. Xerabiyê pir caran bi hilbijartinên hişmendî tê kirin. Ev jî ew rewş e ku ol wekî "durûtî" pênase dikinî Ev nîşanî me dide ku: Xerabiyê ne tenê ji nezaniyê lê di heman demê de ji tercîhên nirxî jî derdikeve.

Xerabî di civakên berî dewlet û desthilatdariyê de jî hebû; lêbelê, van civakan xwedî prensîbên exlaqî yên bihêz bûn ku rê li ber belavbûna xerabiyê digirtin. Ji van civakan re "civakên exlaqî û politik" tê gotin. Tiştê girîng di van civakan de ne jiholêrakirina tevahî ya xerabiyê bû, lê hebûna prensîbên exlaqî bû ku dikarin pê re mijûl bibin. Reftarên xirab ji hêla civakî ve nehatin pejirandin, û heta hatin dûrxistin. Lêbelê, îro pirsgirêka bingehîn ev e: Xerabî her ku diçe normalîze û rewa dibe. Reftarên wekî derew, oportunîzm û dizî pir caran bi hincetan têne pejirandin. Ev dibe sedema tiştê ku em jê re dibêjin "normalîzekirina xerabiyê".

Îro, yek ji çavkaniyên herî bingehîn ên xerabiyê têkiliyên hêzê ne. Motîvasyonên wekî bidestxistina hêzê, serdestî, dewlemendbûn, heyranîkirin(hewldana xwedayina ecibandinê) û bidestxistina avantajê dikarin kesan ber bi tevgerên neexlaqî ve bibin. Ev nirx bi giranî karakterê pergala ku ji hêla mêran ve tê serdest kirin nîşan didin. Her çend rêjeyek pir hindik ji jinan ji vê pergalê sûd werdigirin jî, piraniya wan dibin qurbanên wê. Ji ber vê yekê, nîqaşên etîk û estetîkê rexneyek li ser hêzê jî vedihewîne.


Îro, di civaka Kurd de, etîk û estetîk bêyî ku bi rabirdûyê re qut bibin, lê bi şert û mercên nû ve têne ji nû ve avakirin. Tevgera jinan, hilberîna çandî û têkoşînên ekolojîk dînamîkên bingehîn ên vê pêvajoyê ne. Ev pêvajoya ji nû ve avakirinê ne tenê vejîneke çandî ye, lê di heman demê de pêşxistina modelek alternatîf a jiyanê ye jî. Di civaka Kurdî de, etîk û estetîk bi dîrokî wekî du warên bingehîn ên bi hev ve girêdayî û hevdu xurt dikin hebûne. Tevî şikestinên ku ji hêla moderniteyê ve hatine afirandin, ev her du war îro bi xurtî ji nû ve derdikevin holê, nemaze bi ezmûna Rojava. Di vê çarçoveyê de, etîk û estetîk ne tenê têgehên teorîk in, lê di heman demê de dînamîkên bingehîn in ku rêxistina jiyanê diyar dikin, wate didin berxwedanê û hebûna civakî ji nû ve ava dikin.

Hebûna civakekê rasterast bi nirxên wê yên etîk û estetîk ve girêdayî ye. Çawa ku civakek bê etîk nikare hebe, jiyanek bê estetîk wateya xwe winda dike. Ji ber vê yekê, pêdivî ye ku etîk û estetîk bêyî ku ji çarçoveya wan a civakî werin veqetandin werin çareser kirin. Ji perspektîfek jîneolojîk ve, etîk wekî hişmendî û exlaqê azadiyê tê ji nû ve pênase kirin; ji hêla din ve, estetîk wekî forma ku ev azadî di jiyanê de digire tê ji nû ve pênase kirin. Ev nêzîkatî ne tenê çarçoveyek teorîk e, lê di heman demê de pêşniyarek pratîkî ji bo jiyanê ye. Di encamê de, pirsa bingehîn a ku mirovahî û civak pê re rû bi rû dimînin eynî dimîne: Divê em çawa bijîn? Bersiva vê pirsê ne tenê di ramanê de, lê di her aliyê jiyanê de divê were şember kirin. Ji ber ku mirovek azadbûyî xweşiktir dibe, û jiyanek xweşik wateyek digire.



# Lêkolînek "Sira Sêgoşeya Bermuda" eşkere dike

**Piştî gelek salan sira li pişt "Sêgoşeya Bermuda" di rêya lêkolînekê ku ji hêla zanyarên ji Saziya Zanistê ya Carnegie û Zanîngeha Yale hatiye kirin, eşkere dikin.**




**Navenda Nûçeyan**

Zanyarên ji Saziya Zanistê ya Carnegie û Zanîngeha Yale, ravekirineke nû ji veşartinên jiyolojîk a girêdayî Sêgoşeya Bermuda keşfkirine, ev yek jî piştî keşfkirina pêkhateyek mezin ya kevirî ku di bin qata Okyanûsa Atlantîk de veşartî ye û bi mîlyonan salan alîkarî kiriye ku girav ji asta deryayê bilind bimîne, hat.

Bi dehan salan e, Giravên Bermuda ji bo zanyaran yek ji herêmên herî balkêş mane, ne tenê ji ber efsaneyên bi wan ve girêdayî, lê di heman demê de ji ber pêkhatina wan a jeolojîk a veşartî jî. Ev girava piçûk a volkanîk li naveresta Okyanûsa Atlantîkê li binê deryayê bilind maye, tevî ku çalakiya wê ya volkanîk zêdetirî 30 mîlyon sal berê rawestiyaye.

Bermuda, komeke giravên biçûk li Okyanûsa Atlantîk a Bakur e, bi qasî 650 mîl li rojhilatê Karolînaya Bakurê Amerîkayê ye û nifûsa wê bi qasî 64 hezar e. Zanyar bi demên dirêj meraq dikirin çima ev herêm ji qata kûr a okyanûsê bilind dimîne, tevî ku giravên mîna hev bi gelemperî ji bo parastina bilindahiya xwe hewceyê germahiya volkanîk a domdar in.

Li gorî lêkolîna ku di kovara Geophysical Research Letters de hatiye weşandin, zanyaran qatek kevirî ya mezin û sivik bi qasî 12 mîl stûr di bin qalikê okyanûsî yê kevneşopî yê giravê de keşf kirin, ku ev yek jî şiyana "mayîna li ser kevirên girantir ên derdorê" dide wê.

### Pêkhateyek veşartî di bin okyanûsê de

Lêkolîneran diyarkirin ku ev tebeqe nêzîkî 30 heta 35 milyon sal berê çêbûye, dema ku magmaya germ ji kûrahiya Erdê derketiye û berî ku sar û hişk bibe, di bin qalikê Erdê de belav bûye.

Di raporê de hat destnîşankirin ku ev pêkhateya neasayî ji modelên volkanîk ên kevneşopî yên ku bi gelemperî bilindahiya giravên okyanûsî rave dikin cuda ye, ji ber ku îro tu volkanên çalak an "xalên germ" tune ne ku piştgiriyê bidin bilindbûna Bermuda.

### Zanyaran çawa keşif kirin?

Zanyar analîzkirina daneyên lerizînên erdhejên xwezayî yên ku di zêdetirî 20 salan de ji hêla stasyonek çavdêriya erdhejan a li ser giravê ve hatine tomar kirin, bikar anîne.

Bi rêya lêkolîna veguherînên pêlên erdhejan ên di navbera tebeqeyên kevirên cûda de, tîmê karîbû nexşeyek rast a avahiya jeolojîk heta kûrahiya zêdetirî 25 mîlan di bin giravê de xêz bike.

Lêkolîner William Fraser diyar kir ku Bermuda "rewşek jeolojîk a bêhempa ku bi modelên kevneşopî yên tevgerên di hundirê tebeqeya navîn ya erdê temsîl dike ", herwiha got ku ev dîtin dibe ku pêvajoyên jeolojîk ên kur nîşan bidin ku heya niha bi tevahî jî nehatine famkirin.

### Nîşanên Magnetîkî

Di raporê de hat destnîşankirin ku herêma Bermuda bi dehan salan e bi diyardeyên jeolojîk ên neasayî ve girêdayî ye, di nav de guhertinên biçûk di kişandina erdê de, herwiha nîşanên magnetîkî yên bihêz ku carinan bandorê li kompas û cîhazên navîgasyonê dikin.

Lêkolîneran zelal kirin ku ev diyarde ji ber kevirên volkanîk ên kevnar û dewlemend bi hesin û tîtanyûmê di kûrahiya herêmê de têne dîtin, çêdibin. Di heman demê de tekez kirin ku ev guhertin xwezayî ne û gefek rasterast çênakin.

### Razên Sêgoşeya Bermuda dîsa derdikeve hole

Ev vedîtin eleqeya zanistê û raya giştî ya li ser Sêgoşeya Bermuda, ku navê wê bi dehan salan bi çîrokên nenaskirî yên windabûna keştî û balafiran li Atlantîka Bakur ve girêdayî ye, vejîn dike. Her çend zanyar piştrast dikin ku piraniya diyardeyên bi wê ve girêdayî ravekirinên xwezayî û jeolojîk hene.

# Li Îranê pirsgirêkên kirîn û kirya xaniyan

**Navenda Nûçeyan**

**Li Îranê li gorî daneyên fermî yên dawî, bazara kiriya xaniyan di sala 2026'an de di asteke pir teng û zextê de ye. Gel bi krîza kirîna xanî û kirê de rû bi rû ne.**



Li gorî daneyên fermî yên dawî, bazara kiriya xaniyan di sala 2026'an de di asteke pir teng û zextê de ye, enflasyona kiriya xaniyan a li ser bingeha xalan gihîştiye ji sedî 31.1, enflasyona mehane ji sedî 1.6 û enflasyona salane ji sedî 33.7'e. Her çendî ev hejmar nîşan didin ku rêjeya zêdebûna kirê li gorî enflasyona giştî kêm bûye jî hê ji bazarek normal dûr in ji ber di Nîsana 2026'an de, enflasyona giştî gihîştiye ji sedî 73.5, enflasyona mehane ya giştî bûye ji sedî 5 û enflasyona salane ya giştî bûye ji sedî 53.7. Kirê li gorî qadên din kêmtir zêde bûye lê negihîştiye asteke qebûlkirî. Rapora fermî ya Wezareta Rê û Geşepêdana Bajaran jî heman meylê piştrast dike û dibêje ku kêmbûnê di Tebaxa 2024'an de dest pê kiriye.

### Bihayê kirîn û kirê xaniyan li Îranê gelek bilind bûye

Raportên dawî nîşan didin ku çalakvanên bazara xaniyan li gorî sala borî zêdebûnek ji sedî 30-40 di kiriyan de dîtine, bihayê xaniyan li hinek bajaran ji sedî 40 zêde bûye û ev zext belavî Tehranê jî bûye. Heman rapor nîşan didin ku danûstandinên li paytextê li gorî sala borî hema bibêje nîvî bûne, di heman demê de rêjeyên pêşniyarkirî li Tehranê ji sedî 40-50 zêde bûne ev tê wê wateyê ku zêdebûna serlêdanên pêşniyarkirî ji ya ku di endeksên fermî de hatiye tomarkirin dijwartire û bi lez bilind dibe.

### Malbat neçarin ji ber bihayê dest ji pêdiviyên esasî berdin

Li gorî raporên dawî, ji sedî 25'ê nifûsa Îranê kirêdar in, ji sedî 66'ê niştecihên bajaran xwediyên xanî ne û yên mayî jî kirêdar in. Xizanî di nav kirêdaran de belav e, ji sedî 100'ê kirêdaran di asta yekem de û ji sedî 80'ê kirêdarên di asta duyem de wekî xizan têne hesibandin.

Heman rapor dibêje ku zêdetirî 2 milyon 'xizanên xaniyan' li van çar parêzgehan kom bûne: Tehran, Xorasan Rezewî, Esfehan û Fars. Ev tê vê wateyê ku krîz ne tenê li ser 'bihayên bilind ên xaniyan' e, bûye mekanîzmayek ku xizaniya bajarî ji nû ve çêdike.

Her wiha zexta rastîn di budçeyên malbatan de tê dîtin. Lêkolîn nîşan didin ku rêjeya xaniyan di xercên malbatên Tehranê de di sala 2024'an de gihîştiye nêzî ji sedî 60, li gorî hinek texmînan, rêjeya xaniyan li deverên metropolan gihîştiye rêjeya nêzî ji sedî 50 heta ji sedî 70.

Li gorî texmînan di sala 2025'an de ji sedî 42.2'ê dahata giştî ya karkeran ji bo xaniyan hatiye xerckirin. Di vê çarçoveyê de, zêdebûna mûçeyê herî kêm 16.6 milyon tumen û mafên xaniyan 3 milyon tumen, di sala 2026'an de zêdetir dişibe rêziknameyeke îdarî ya xaniyan a bersivek li hemberî rastiyên bazarê. Di vê rewşê de, malbat neçar in ji bo dabînkirina hewcedariyên xaniyan dev ji xwarin, pêwîstiyên tenduristiyê û perwerdeyê berdin.

### Cudahî di navbera sînorê qanûnî û rastiya bazarê de

Li aliyê din, siyaseta fermî ya hikûmetê li cihê çareserkirina koka pirsgirêkê, bala xwe daye ser tezmînata demkurt. Di sala 2025'an de, li Tehranê sînorê zêdebûna kirê wekî ji sedî 25 hat ragihandin û rayedarên Meşhedê jî diyar kirin ku rêjeya qanûnî ji sedî 25 e; lê belê, raporên qadê nîşan didin ku zêdebûn gihîştiye ji sedî 30 heta ji sedî 40. Ev tê wê wateyê ku cudahî di navbera 'sînorê qanûnî' û rastiya bazarê de girîng e. Pakêtên piştgiriyê piranî li ser bingeha tesîsên emanetê ne, li gorî rapora fermî ya Nîsana 2026'an, sînorê deynê emanetê ji bo Tehranê gihîştiye 365 milyon tumen, ji bo navendên parêzgehan gihîştiye 280 milyon tumen, ji bo bajarên din gihîştiye 185 milyon tumen û ji bo gundan gihîştiye 75 milyon tumen. Planeke din deynê emanetê yê 400 milyon tumen ji bo komên kêmdahat û piştgiriyê pêşbînî dike. Lê belê, ji ber ku bihayê kirê li gelek deveran ji dahatê zûtir zêde dibin, ev tesîs ji dermanê nexweşiyê bêthir 'roleke nefesgirtinê' dilîzin. Tebeqeya kûrtir a krîzê di girêdana pirgirêka xaniyan bi bêkarî, nediyarî û koçberiya civakî de tê dîtin. Li gorî rapora ILNA ya li qadê bi kirêgiran re kiriye, eşkere dike ku daxwaza heyamek paşxistina dravdanê ji xwediyên xanî, bikaranîna emanetan ji bo dayîna kirê, barkirina ji bo malek piçûktir û taxek erzantir, jiholêrakirina lêçûnên jiyanê û koçberbûna derveyî bajêr. Heman rapor destnîşan dike ku hejmarek girîng ji kirêgiran ji ber tirsa bêkariyê karên xwe winda kirine yan jî dravdanan bi paş dixin.

### Newekheviya di aboriya Îranê de

Texmîneke din a tabloya demdirêj sosret e. Li gorî texmîneke din dema ji bo li Tehranê bibin xwediyê xanî 89 sal e û li seranserê welêt 49 sal e. Ev hejmar nîşan didin ku xanî li Îranê ne tenê ji bo çînên jêrîn negihîştî dibe, di heman demê de ji bo beşeke mezin a hêza kar dibe qadeke ku 'nikare bigihîjîne' her diçe zêdetir dibe.

Bazara xanî ya Îranê ketiye qonaxa enflasyona aram lê bi krîzê dagirtî ye. Ev tê wê wateyê ku her çendî rêjeya zêdebûna kirê li gorî enflasyona giştî hinekî kêm bûye jî asta biha wisa zêde bûye ku bi taybetî ji bo malbatên ku mûçe qezenc dikin li Tehran û bajarên mezin, wateya wê ya pratîk hê jî xizaniya xanî, kêmbûna debara jiyanê û dûrxistin e.

Dema di vî alî de were mêzekirin, tê dîtin ku kirê êdî ne bazareke cuda ye, parçeyeke mekanzîmaya belavkirina newekheviya di aboriya Îranê de ye.

# Tirkiyê li ser xaçerêyekê ye: Dema ku dadwerî dibe çekekî siyasî

Cemîl Xoce

Bûyerên ku van rojan li Tirkiyeyê diqewimin, ji bo kesê ku rewşa siyasî ya vî welatî ji nêz ve dişopîne, sosret nîne. Betalkirina dadgehê ya hilbijartinên serokatiya CHP'ê ya sala 2023'yan biryareke dadgehî nîne. Ew di naveroka xwe de darbeyeke siyasî ya armancdar e. Armanca wê ya bingehîn dûrxistina serokê niha yê partiyê Oğur Özel e û li şûna wî anîna Kemal Kılıçdaroğlu careke din ser dika opozisyonê ye. Peyzaja heyî vê yekê bi zelalî piştrast dike.

Çima Kılıçdaroğlu bi taybetî?

Ev ew pirsa bingehîn e ku divê em bi dirêjahî li ber bisekinin. Kılıçdaroğlu, mixalifekî rastîn nîne. Ew mirovekî ji hundirê pergala "dewleta kûr" e. Hebûna wî li serê opozisyonê desthilatê nerehet nake, berovajî wê desthilatê rehet dike. Şahidiya vê yekê ew e ku Devlet Bahçeli, hevalbendê Erdogan û hevkarê wî di desthilatê de, berê eşkere îşaret pê kiribû ku Kılıçdaroğlu dê ji bo wan "çêtir" be, bi taybetî di dosyaya ku ew jê re dibêjin "Tirkiyeya bêteror". Ev têgîn tenê wekî bihaneyekê ji bo zextdanê li ser tevgera kurdî û nûnerên wê yên siyasî bike, tê bikaranîn.

Axaftina Bahçeli axaftineke jixweber û normal nîne. Mirovê ku di dema wî de dengdana rakirina parêzbendiya parlamentoyê ya Selahaddin Demirtaş û hevalên wî pêk hatibe û yê ku li ber operasyonên dagirkirina Rojava ranewestiyabe, bê guman wê xetereyeke rastîn ji Erdogan re jî çêneke. Hatina wî ser serokatiya partiyê ji bo desthilatê destkeftiyek e, ne windahiyek e.

Di vê çarçoveyê de, Partiya DEM'ê bê deng nema û daxuyaniyek weşand. Tê de biryara betalkirina hilbijartinên serokatiya CHP'ê şermezar kir û ew weke êrîşeke eşkere li ser îradeya partiyê û rêça demokratîk hesiband. Ev helwest bi temamî di cihê xwe de ye, lê di heman demê de di bin mercên niha de dengekî sînordar dimîne. Parlamento ji piraniyeke hêsan a koalîsyona AKP-MHP'ê pêk tê û Partiya DEM'ê bi tenê nikare vê rastiyê biguhêre, çiqasî jî dengê wê bilind bibe.

Li vir, gelek kes li ser kolana Tirkiyeyê hesabên xwe dikin û bawer dikin ku gel dikare zextê li ser desthilatê bike û rê li ber avêtina Özel bigire. Lê ezmûna dîrokî piştgiriyê nade van hesaban. Serhildana Geziyê ya sala 2013'an bûyereke mezin bû. Gel bi hejmareke mezin derket kolanan, lê ew bi dawî bû bêyî ku li ser erdê tiştekî berbiçav pêk bîne. Sedem eşkere ye: Dema ku saziyên leşkerî û ewlekariyê di destê desthilatê de bin, kolan nikare guherîneke rastîn pêk bîne. Ji vê zêdetir jî, Yekîtiya Ewropayê bi bêdengiyeke şikgirtî rûniştiye û mîna ku tiştek nebûye tevdigere. Her wiha serokên welatên cîhanê di nav wan de Trump pêşbaziyê dikin ku xwe nêzî Tirkiyeyê bikin û dilxweşiya wê qezenc bikin. Ev yek jî dike ku zexta navneteweyî li ser Erdogan hema hema nemîne.

Peyzaja heyî tenê bi meyzekirina rewşa hundirê Tirkiyeyê temam nabe. Erdogan, bi piştgiriya Brîtanya û li pişt wê Amerîka û Îsraêlê, li ser hemû saziyên dewletê serdest bûye. Van hêzên navneteweyî dixwazin ku Tirkiye dewleteke biryar-navendî be. Saziyên wê yên leşkerî û dadgehî û parlamento di nava wan de nakokî çênebin, hemû di yek arasteyê de û bêyî tu astengiyan bi hev re bimeşin. Hatina Kılıçdaroğlu vê wêneyê bi temamî temam dike: Opozîsyoneke şiklî ya ku xetereyeke rastîn pêk nayîne û parlamentoyeke bi tevamî di bin kontrola Erdogan de be, hebe. Bi vî awayî, Tirkiye dibe dewleteke li gorî dilê wan hêzan: Yekgirtî di biryarên xwe de û dûr ji aloziyên hundirîn.

Li hember vê rastiya tevlihev, Partiya DEM'ê dê zêde nikaribe tiştekî bike. Ne hêza wê têra xwe ji bo xistina maseyê heye û ne jî amûrên ku hevsengiya hêzê bi şêweyeke bingehîn biguhêrin, hene. Di vir de, "bêdengiya afirîner" derdikeve pêş. Bêdengiya afirîner ne teslîmbûn e û ne jî dsvjêberdana ji prensîban e. Ew hesabeke sar ji hevsengiyên hêzê re ye û xwendineke rast a mezinahiya îmkânên berdest e. Qêrîn li hember dîwareke hişk bêyî xwedîbûna amûrên bandorê yên rastîn ne mêrxasî ye, berovajî wê xerckirina enerjiyê û windakirina firsendê ye. Tirkiye di qonaxeke dîrokî ya hesas re derbas dibe û tiştê ku tê de diqewime ji bikaranîna dadgehê bigire heya ji nû ve şêwekirina opozisyonê û bêdengiya navneteweyî ya şikgirtî, hêjayî wê ye ku bi çavekî lêkolînê û mêjiyekî sar were xwendin.

# Tekez gerek were zanîn ku hişmendî û fikarên cemidî jiyana civakê dixeniqîne!

Leyla Amûdê

Hatiye tekezkirin ku tirsa di fikir de bingeha, hemû tirsaye û di bingeha hemû dogmayan de jî hişkberbûyîna fikir û ramanê pêşiya veguherîna diyalektîkê(Dualîbûyînê) jî digire û dibe weke astengekê jêre. Dogmayên fikrî yanî fikarên cemidî û bi guherîn jehreke wiha ye ku dikare çavkaniya herî afrêner û dewlemend jî hişk bike û birizîne. Di nava rûpelên dîroka mirovahiyê de olperestî, netewperestî, zanistperestî û zayendperestî kevirên esasî û yên qurziyên dîwarên dogmayan e. Ew kevirên hişkberin ku hiştine weke hişmendîya, dogmatîk her ku biçe di nava ferd û civakê de zêdetir kûr bike. Rêber Apo divê derbarê de dibêje ku ez ji bîrdoziya baviksalar hêrs dibim û nefreta min li hemberî wê zêdetir dibe. Civaka bavikanî ji dogmayên hişmendî hêzeke mezin digire. Hêz û bedena jin û ciwanan ku pêşengên civakê ne weke dixwazin bi kar tînin.

Ev hewcehî hiştina ciwanan heta îro jî zêdetir dewam dike. Serdestiya bîrdozî û ezmûnan bi hêsanî nayê şikandin. Daxwaza ciwanan ya ji azadiyê re jî bingehê wê ji vê rastiya dîrokî tê. Ji zanyarên berê heta yên îro û saziyên wan, agahî û zanebûn ji ciwanan vedizîne. Agahiyên didin zêdetir ji bo tevizandin û hewcehîştina ciwanan ji pergala wan re ye. Pergalên zordar û xasok polîtîka xwe weke propaganda bikartînin û bîrdozî û taxtîkên xwe li ser jinê didin meşandin. Û ew rêbaz hemû ji bo ku ciwanan bikin bin baskên xwe de. Ji bo ku xwesteka ciwana ya jiyana wekhev û azad, sist bikin û wan ji rêka rast derxînin û ji pergala xwe re; weke amûr bikarbînin û civakê jî bêparastvan bihêlin. Herwiha ji bo ku pergala desthilatdar, xasok û kujerê kastîk ciwanan bêbandor bihêle û ji bo pergala xwe bikar bîne gelek têgehan bikartînin û weke nimûne jî ji ciwanan re wiha; telefuz dikin û dibêjin: Cahil, nezan, beradayî, serxweş û hwd. Û ev jî hemû bi hedefa biçûk xistina ciwanan têne bikaranîn. Nexwe ti têkiliya wan têgeh û leqeban bi rastiyê re nîne. Dîsa ji bo ku hêzên ciwan, jin û hemû beşên civakê, bikarbînin her rêbaz û rêkan ji bo xwe rewa dibinin û ji bo ku; jin û ciwan û tevahî civak nekevin zefta pergala serwer û jêre nebin amûr û neyên bikaranîn, tekez gerek werin perwerde kirin û birêxsitin bibin. û ji bo ku weke, hêza herî dînamîk tekoşîn bikin şiyar kirina wan, gereke û wê tekez ew jî bi perwerda; siyasî, dîrokî û fikrî were pêkanîn.

Û weke ku têye zanîn pergala fînans peran, ciwanan bi sê siwarên mehşerê ku jin û ciwanan ji hêz dixin û dikin; amûr ji xwe re. Û ciwanên ku hîna temenê wan biçûke jî bi rêbazên, şerê taybet wan dikine weke sewalan û wan dimijara xerîze û zayend e; difetisînin ji xwe di van 10 salên dawiyê de ciwan bi zewacê re mijûl dikin û weke ku têye zanîn; xizanî jî pir lipêşe û piştî her zewacekê tekez berdan jî, heye û ev dibe sedema ku civak dihêla exlaqî de jî tefesixê jiyan bike. Û ciwan bi dogmayên bêzanebûn û hişk ve, weke qeder tên girêdan. Lê gerek were zanîn ku ciwantiyeke ber bi azadiyê ve ketibe rê, zehmete pêşî lê were girtin. Û tekez hêza ciwan li ser serê pergala desthilatdar, dibin xeterîya herî mezin. Di tevahiya dîrokê de bi navê perwerdê ciwantî kirine qurban û tiştên ku aqil jê nagire û xeyal nayên kirin, bi serê ciwanan de anîne...Di pêşketina civaka tîk- heremî(Tedrîcî) de piştî jinê vê rewşa ciwanan roleke diyarker lîstiye.

Pergala ku ciwan xistin e bin destê xwe de heta dawiyê ji xwe piştrast e. Pişt re jî pergal civaka dewletparêz dide birêxistin kirin û hemûyan jî bi heman, awayî kiryarên xwe li ser ciwanan ferz kirin. Ciwantiyeke mejiyê xwe hatibe tevizandin û şuştin, mumkîne her kar pê bê kirin. Şer jî di nav de, her karê zehmet dikare bike. Wek şîroveya dogmayî ku rêbaza diyalektîkê, bi vî awayî mirov nikare bi tevahî li dîrokê serwext bibe. Dogmayên dewletên netewe û dogmayên ku şaristaniya sermayeparêz li ser ferd û civak ferz dike xirabtirin û kûrtrîn dogmayên dîrokê ne. Bi rêya çanda girseyî û jiyana lîberal zêhnê mirovan teslîm digirin. Dîrokên netewperstî, şovenîst ku ji aliyê desthilatdarên wekî Hitler, Musolînî, Franko û roja me ya îro de şovenîzma li Tirkiye, mirovan li hemberî rastiyan serkorî dikin û tine dihesibînin, çolên nû yên zêhnî diafirînin.

Nîşaneyên vê yekê wekî li tirkiye û pir welatên din ruxmê ku, dinava krîzeke mezin ya aborî, exlaqî, çandî û civakî de ne jî lê cardin jî dest ji înkar û tüne kirine bernadin. Êdî bi awayên berê em weke jin û ciwan pêwîste nefirkrin û nejîn, di encama sentezekê de bi nirxên nû û bi formên nû bijîn. Ji holê ranebûne, bi reng û awayên xwe yên guhertî bijîn. Ji bo ciwanan û jinan di nav diyalektîka dogmatîk de nefetisin û bûyerên dîrokî rast şîrove bikin, divê aliyê hilbijartina rêbazê de gerek nerm nêz bibin. Rêber Apo weke ciwanek dest bi têkoşînê kir ji wan dogmatîkên pozitivîst xwe rizgar kir. Bi xwendinên xwe yên dîrokî, lêkolîn, tehlîl kirin û diyalektîka felsefîk û sosyolojîk a xwe hertim hişyar bû kû nekeve nava xefikên pergala şaristaniya sermayeparêz de. Piştî ku li dijî pergala şaristaniya sermayeparêz bênavber têkoşîn kir li ser şopa dîroka mirovahiyê alternatîf afirand.

Li ser rêya şaristaniya demokratîk, modernîteya demokratîk civak demokratîk kirin û neteweya demokratîk şîn kirin û bi vî rengê bû nexşerêya têkoşîna apogerî. Fikrên dîroka olperest û milletperest ji pêşkêşkirina dogmayan wêdetir, vegotinekê pêşkêş nakin. Xwedîderketina li sosyolojiya çanda Rojhilata Navîn çiqasî girîng be, encamên derkevin holê jî wê ji bo alîkarîdayîna zanista sosyolojiyê jî ew çend mezin be. Rexnekirina dewleta netewe û îdeolojî çiqasî girîng be, pêşkêşkirina alternatîfa wê jî wezîfeyeke ji wê jî girîngtir e. Di herhalî de wexta alternatîfek were danîn, ji prensîpên bingehîn ên divê li ber çav bê girtin a yekemîn, yekparebûna çandê ye û hevgirtina civakê ye. Nexasim jî yekitiya jin û ciwana ye ku wê li ser, çavkaniya pergala demokratik û azadiya jinê be.



# Îran li şûna pênûsan, çekan dide zarokan!

Ji destpêka êrişên DYA-Îsraîl li ser Îran, siyaseta biçekirina sivîlan û bi taybet zarokan ji hêla rêjîma Îranê ve tê ferzkirin. Bi vî rengî Îran zarokan dûrî zanîn û perwerdeyê dixe û ji bo berjewendiyên xwe yên stratejîk zarokan fêrî çekan dike.

Hemza Sêvo/ Qamişlo

### Hewesa şer û seferberiyê ji mêjû heya hemdemiyê li Îran

Li her welatekî dema ku xeteriya şer û pevçûnan nêz dibe, daholên şer lêdidin, rewş tê guhertin, heldanên ji bo çareserkirina pirsgirêkan bi riya diyalog, aramî, ragirtin û xebata dîplomatîk têne kirin. Li hêlekê rewşa çavdêriya ewlehî xurt dibe, hem piştgiriya gel ji bo bilindkirina moralê hêza leşkerî û ewlehiyê derdikeve pêş, li hêla din jî hikumet, sazî, siyasetmedar û partiyên siyasî bi rola xwe ya sereke radibin. Biçekkirina sivîlan li Îranê ne tenê analîzeke teorîk e, lê rastiyeke ku bi belgeyan û li pêşberî her kesî tê jiyîn. Raporên ji hundirê Îranê di mehên dawî de eşkere dikin ku aloziyên ewlehî û leşkerî zêde dibin, di warê berfirehbûna pevçûnên herêmî de û guhertina qadên şer ber bi hundirê Îranê, Îran gelekî bi tirs e. Îran di rewşeke wiha de ku wêne, dîmen û axaftin belgekirî ne seferberiya civakî ya berfireh li Îranê rûdide, di nav de jin û hemû qatên civakê cihê xwe digrin. Lê pirsgirêka herî xeternak ji vê rewşê ne çek bi xwe ye, lê îdeolojiya li pişt wê ye. Dema ku dewlet digihîjin xalekê ku ew hewce dibînin tevahiya civaka xwe veguherînin xeteke parastinê, ev tê vê wateyê ku tirs bûye beşeke bingehîn ya ruhê dewletê. Sivîl êdî ne tenê welatiyek e ku jiyana xwe ya rojane dijî, lê di nava xwe de mîna leşkerekî ye ku dibe tevlî şerekî bibe. Îran bi dehê salan di bin mantiqê dewletek dorpêçkirî de jiyaye. Ji Şoreşa Îslamî û bi şûn de piraniya gotara fermî ya dewletê li ser fikra gefên derveyî, kompLoyan û rewşek domdar a amadebûna ji bo şeran hatiye avakirin. Lê salên dawî ev atmosfer zêde bûye, nemaze bi zêdebûna rageşiya bi Îsraîl û Dewletên Yekbûyî re, hem jî zêdebûna hejmara êrîş, grev û xwepêşandanên li Îranê.

### Hewesa ku civakê di metirsiyê de dihêle

Rêjîma Îranê bi zanebûn şerekî taybet li ser civakê bi kar tîne, dihêle nav vê aloziyê de, jin û zarok bi awayekî tirsnak bi rewşa siyasî û ewlehiyê ve bên girêdan. Zêdeyî 6 mehan e ku li Îranê xwepêşandan rû didin, gelên Îran û Rojhilatê Krudistanê ji bilî Raperîna Jin Jiyan Azadî ya ku temenê wê bûye 4 sal. Raporên rêxistinên mafên mirovan asta zêdebûna hedefgirtina jinan di dema xwepêşandan de belge kirine, li hêla din hejmareke girîng a jin û zarokan di pevçûn û êrîşên dawî de hatine kuştin, belge kirine. Jinên Îranî di salên dawî de bûne sembolek dualî, ji aliyekî ve, ew sembola berxwedan û nerazîbûnê ne, wekî ku di doza Jîna Emînî de tê dîtin, ji aliyê din ve ew bûne yek ji komên herî tepeserkirî û bindest di civaka Îranê de. Ji ber vê yekê tevlîkirina jinan di seferberiyê de ne her gav wekî hêzek rastîn xuya dike, lê belê civakê her tim di hewesa rewşeke awarte de dihêle.

### Zarok jî dibin qurbaniya biçekkirin û qada şer

Di 26'ê Adara 2026'an de, berpirsekî ji Lîwaya 27emîn a Mihemed Resûl Allah a Pasedaran li Tehranê diyar kir ku pêngava wergirtina sivîlan a bi navê Parêzvanên Welat ji bo Îranê, temenê herî kêm ji bo wergirtina leşkeran, ji kesên 12 salî û bi jor de destnîşan kir. Di nav hezaran êrîşên Dewletên Yekbûyî û Îsraîlê de li seranserî Îranê zarokên li navendên leşkerî dê di xetereya kuştin û birîndarbûnê de man. Zarok êdî di atmosferekî wiha de jiyan dikin. Dema ku nifşek bi mûşekan, gotinên leşkerî û tirsa şer û hilweşînê mezin dibe, dewlet ne hewce ye ku rasterast çekan li wan belav bike, ji ber ku hişmendiya wan bi xwe dibe çekekî psîkolojîk.

### Zagonên navdewletî çawa li vê diyardeyê dinere

Navbera neteweyek ku gelê xwe diparêze û neteweyek ku gelê wê her tim hewce dibîne ku ji bo wê xwe feda bike cudabûneke mezin heye. Welatên ku ji bo demên dirêj di nav zihniyeta dorpêçkirinê de dijîn, pir caran hêdî hêdî civak di wê dewletê de vediguhere civakeke tirsonek. Pirsgirêk ev e ku Îran îro ne tenê di bin zextên hêzên derveyî de dijî, lê bi westandina kûr a navxweyî re jî rû bi rû dimîne. Aboriya Îranê êşê dikişîne, xwepêşandan pir caran tên lidarxistin û civaka Îranê di navbera kesên ku tepeserkirinê wekî pêwîstiyekê ji bo parastina welêt dibînin, herwiha kesên dibînin ku biçekirina civakê tenê dê bibe sedema fetisîna sivîlan û berdewamkirina kirîza heyî .Dema ku dewlet dest bi axaftina bi jin û zarokan re bi zimanê şer, xeteriyê dike, ew êdî ne tenê siyaseteke ji bo ewlehiya xwe ye, lê aramiyê ji dilê civakê didize û her tim di nav ruhê civakê de xeteriyê ava dike. Civakên ku ewqasî bi ramana şerekî nêzîk dijîn, hêdî hêdî şiyana xwe ya jiyana normal winda dikin. Di dawiyê de, pirsa rast ne ew e ku gelo Îran divê gelê xwe bi çek bike, lê wê çi bi serê civakekê were ku bi salan hîs dike ku şer dikare di her kêliyê de bigihîje ber deriyê mal, kolan û zarokên wan? Êşa herî mezin bi vî rengî dest pê dike, dema ku tirs bi xwe dibe şêwazekî jiyana rojane. Rêveberê Beşa Mafê Zarokan di Human Rights Watch de Bêl Fan Isfld da zanîn ku tu hewcedarî û buhane tunene ji pêngava leşkerî ya çekdarkirina zarokan re ya ku Îran bi kar tîne, bi vî rengî zarok dibin hedefa vê pêngavê, bi taybet zarokên ku temenê wan 12 sal in. Bi kurtasî rêjîma Îranê amade ye ku jiyana zarokan bixe xeteriyê da ku hêzeke mezintir bi dest bixe. Di rapora xwe ya yekem de Komîteya Mafên Zarokan a Neteweyên Yekbûyî Îranê bi bîr anî ku qanûnên Îranê tekez dikin ku temenê herî kêm ji bo tevlîbûna hêzên çekdar bi mebesta wergirtina perwerdehiya leşkerî 16 sal e û temenê herî kêm ji bo tevlîbûna hêzên polîsê 17 sal e. Herwiha Konseya Ewlehiyê ya NY'ê bi tundî tevlîbûna zarokan bo qada leşkerî şermezar kir û mekanîzmayek hişyariyê ji hêla sekreterê Giştî yê konseyê ve saz kir. Ev mekanîzm leşkerkirina wisa wekî binpêkirinek mezin li dijî zarokan dibîne. Peymana Mafên Zarokan leşkerkirina zarokên di bin temenê 15 salî de qedexe dike. Protokola Vebijêrk a peymanê ku Îranê îmze kiriye, lê Îranê protokola ku temenê herî kêm ji bo beşdarbûna rasterast di şer de 18 salî destnîşan dike, nepejirandiye. Îran tevî ku bi zagona navneteweyî ve girêdayî ye ya ku leşkerkirina zarokên di bin 15 salî de wekî sûcê şer dibîne, lê dîsa vê zagonê bin pê dike.

### Armancên Îranê ji vê siyasetê û derencamên wê

Sedema sereke ya ku rêjîma Îran sivîl û bi taybet zarokan dike beşek ji amadekariyên şer, ne tenê gefên derveyîn in, lê herî zêde krîza navxweyî û tirsa dewletê ji siberoja xwe heye. Dema ku aborî lawaz dibe, xwepêşandan zêde dibin û baweriya gel bi rêjîmê kêmtir dibe, dewlet dixwaze bi afirandina hestekî xetera neteweyî civakê li dor xwe kom bike. Ji ber vê yekê biçekkirina sivîlan û tevlîkirina zarokan di nav projeyên leşkerî de ji bo rêjîmê ne tenê pêdiviyeke, lê rêbazekî siyasî ye ku civakê bi tirs û hestê şer kontrol bike. Rêjîm dixwaze nifşên nû ji zaroktiya xwe ve bi zimanê şer, fedakarî û parastina welat mezin bibin, da ku her kes xwe ji bo şerê siberojê amade bibîne. Ev rewş bi taybetî ji bo zarokan pir xeternak e, ji dêvla ku zarok rahêjin pênûsê, rêjîma Îranê çek dide wan. Dema ku zarok her roj gotinên mûşekan, êrîşan, şehîdbûnê û xeteriyê dibihîzin, ew hêdî hêdî bi tirs mezin dibin. Jin û zarok bi taybetî dibin qurbaniya vê siyasetê, ji ber ku rêjîm hem wan wekî sembola fedakariyê nîşan dide û hem jî wan di xetera rastîn a şer de dihêle. Eger ev zihniyeta leşkerî li Îran berdewam bike, di siberojê de dê civak hêdî hêdî ji jiyana sivîl dûr bikeve û nifşek mezin bibe ku şer ji bo wan bûye parçeyek normal ê jiyanê. Ev jî dikare bibe sedema zêdebûna aloziyên navxweyî, kêmbûna baweriya civakî û rûdana kirîzeke kûrtir a psîkolojîk û civakî û wê bi salan bidome.



# Hişmendî û yekîtî rêya parastina ji Şerê Taybet e

**Şerê Taybet di roja îro de bi rêya medyayê, torên civakî û propagandayê zêdetir tê bikaranîn. Belavkirina derewan, tirs û bêhêvîtî di nav civakê de pêk tîne, mirovan ji çand, ziman û nirxên wan dûr dixe. Hêzên sermeyedar û dewletên desthilatdar bi van rêbazan raya giştî kontrol dikin. Gelê Kurd jî di hedefa vê şerî de ye, lê hişmendî û yekîtî rêya parastinê ne.**

Ronaz Silêman

Şerê Tayber yek ji şerên kevnar e yê dîrokê ye ku di roja îro de rêbazê xwe nû dike. Ev şer ji aliyên dewlet, desthilatdar, bi taybet dewletên sermeyadar ve tê meşandin. Di roja îro de jî pêşengiya Şerê Taybet kapîtalîzm e, ger em bêjin erê an na jî, kapîtalîzmê jehra xwe berdaye nava hemû tiştên li ser rûyê erdê.

**Şerê Taybet çi ye û rêbazên wê çi ne?**

Şerê taybet ew amûra serdestiyê ye ku armanc dike civakê ji hundir ve hilweşîne, exlaqê wan xirab bike û wan bike koleyê xwe. Rêbazên wê yên sereke ev in: Şerê Derûnî, belavkirina tirs, bêhêvîtî û bêbaweriya di nav gel de.

Bêçandîkirin (Asîmîlasyon): Hewldana jêbirina ziman, çand û dîroka civakê.
Xirabkirina exlaqê civakî: Bikaranîna madeyên hişbir, fihûş û teşwîqkirina jiyana bêexlaqî ji bo lawazkirina civakê.
Parçekirin: Afirandina nakokiyan di navbera malbat, eşîr û komên civakê de.
Propaganda reş: Belavkirina agahiyên derew li ser têkoşeran a kesên navdar, ji bo reşkirina wan.

**Şerê Taybet li ser şêwazê jiyana mirovan serdest bûye**

Şerê Taybet, şerê psîkolojîk, nerm, agahdariyê, şuştina mêjî û şerê bêxwîn ye, ev hemû li dora ramana bingehîn a form û rêbaza operasyonên ku derûniya mirovan hedef digirin, dizivirin. Hêzên ku amûrên van operasyonan ne, şêwazek taybetî ya tevgerê ferz dikin ku xizmeta berjewendî û rojevên wan ên îdeolojîk, siyasî û bazirganî dike. Lêkolînek kûrtir a diyardeya Şerê Taybet, nemaze amûrên wê, eşkere dike ku ew bi awayekî tirsnak li ser şêwazên jiyana me serdest bûne. Redkirina adet, kevneşopî û mîrata dîrokî, exlaqî û civakî, teqlîdkirina yên din û teslîmbûna ji bo modelên biyanî re, êdî ne erkên şerê kevneşopî ne. Bi rêya van beşan, armanca me ew e ku rêbazên vî şerî û sepandinên wî yên pratîkî eşkere bikin, da ku em wan fêm bikin, ji wan haydar bin, mekanîzmayên xwe yên parastinê xurt bikin û bandora wan li ser jiyana xwe, kêm bikin.

**Şerê Taybet**

Şerê Taybet hemû operasyonên



medyayê, psîkolojîk û îstîxbaratê, ji bilî yên aborî û siyasî, vedihewîne. Ew ji têgehên kevneşopî yên bandorkirina li ser derûniya mirovan berfirehtir û xeternaktir e. Dewlet berê xwe didin bikaranîna teknîkên Şerê Taybet, ji ber bawer dikin ku ew rêbazê bidestxistina serkeftinek siyasî û heta serkeftinek leşkerî ye jî.

**Derketina wê**

Her çend rêbazên wê di serdemên nûjen de hatibin guhertin jî, dîroka şerê taybet pir kevn e. Ew bi avakirina dewletên yekem ên çînî re dest pê kiriye. Ev şer her tim li hemberî jin û civakê hatiye meşandin. Herwiha her çend Şerê Taybet di dema Şerê Cîhanê yê Duyemîn de derket holê û di nîvê duyemîn ê sedsala 20'an de di Şerê Sar de bi berfirehî hate bikaranîn jî, lê karanîn û pratîkên wê demek dirêj beriya wê ne.

**Pêdiviyên Şerê Taybet:**

Ji bo Şerê Taybet amûr û rêbazên taybetî hewce dikin, herwiha ew li gorî erkên xwe yên hatine destnîşankirin, hatiye çêkirin. Ew bi hêzên sereke yên ku şer an pevçûnê dimeşînin re paralel tevdigere, heman armanc an hedefê xizmet dikin, bi karanîna amûr û rêbazên ku li dijî pîvan û rêzikên exlaqî yên ji hêla mirovahiyê ve hatine danîn, nakok in. Mînak Şerê Taybet qanûn û rêzikên mirovan paşguh dike.

**Çi Şerê Taybet (nerm) ji şerê leşkerî yê (germ) cuda dike?**

Şerê Taybet bi fermî nehatiye ragihandin û dikare were înkarkirin. Ji bo rewakirina xwe, hewceyî hincetên tevlihev nîne. Budceya wê ne pir mezin e. Di nav hêzên êrîşkar de tu qurbanî tune. Şerê Taybet amûrên sivîl, înternet, telefon û medyayê pir caran ji bo xwe bikar tîne. Encam biryardar û zûtir in. Hêzên êrîşkar bi rêxistinên navneteweyî re nakevin pevçûnê. Amadekariyên wan bêdeng û gav bi gav in, gelek tiştên din hene ku Şerê Taybet ji şerê leşkerî cuda dike hene.

**Exlaq û madiyeta civakê bi "Şerê Taybet" ve hatiye girêdan**

Şerê taybet bi karanîna hemû rêbazên madî û exlaqî, bi armanca kuştina îradeya aliyê din û afirandina rewşek bêhêvîbûn, nebûna baweriya bi xwe û bêxemî ku dibe sedema bêhêvîtiyê û hilweşîna pergala exlaqî ya civakê, ji bo bidestxistina armancên xwe, dixebite. Ango ew armanc dike ku bi israrkirina li ser belavkirina derewan, propagandayê û zêdekirina mijarên nezelalî û tevliheviya derûnî, biafirîne. Çavdêr û plankerên vî şerî jî hewl didin ku bandorê li dil û mejiyan bikin û wan li gorî berjewendiyên xwe rêve bibin.

Gelên Rojhilata Navîn û cîhanê bi giştî, bi taybetî jî gelê Kurd, dikeve çarçoveya vî şerê taybet. Ji ber ku hêzên şerê taybet bi berdewamî û israr dixwazin ruhê parçebûnê û afirandina fitneyê di navbera hemû gelan de belav bikin û wan li dijî hev gur bikin. Herwiha hewl didin ku meyla nijadperest a şovenîst di giyanê gelan de biçînin û nakokiyên mezhebî, olî û etnîkî pêş bixin, da ku bigihîjin armanca xwe ya dagirkirinê.

**Şerê medyayê**

Wekî ku tê zanîn, medyayê roleke girîng di veguherandina mijarên girîng çi civakî, siyasî û çi aborî be jî, bo mijarên raya giştî de dilîze. Herwiha medya beşdarî çareseriyên dadperwer ên van pirsgirêkên bingehîn ên ku bandorê li civakê dikin û wan hêsan dike, dibe. Lê belê, roleke pir qirêj û kirêt jî, ji hêla dezgehên medyayê yên girêdayî rejîm û desthilatdarên serdest û yên xwedî bandor û sermayeyê ve tê lîstin jî, heye. Ev dezgehên medyayê dibin amûrên ku xizmeta rejîmê û hevalbendên wê dikin, da ku raya giştî ber bi mijarên ku ji hêla vê rejîmê ve hatine pejirandin ve bibin û wêneya wê ya kirêt spî bikin.
Tiştê ku îro tê kirin jî, mînakek vê rola kirêt e ku ji hêla hin dezgehên medyayên dijberî rastiyê ne, tê lîstin. Wekî din, ew mirovên asayî, bêalî dixapînin û wan ber bi rêyên ku ne di berjewendiya wan de ne, dibin.

**Şerê psîkolojîk**

Ew hewl dide ku moralê civakê têk bibe. Pêşî bi wê yekê ku baweriya gel bi xwe û dû re jî bi hêzên ku mafên wê diparêzin, xera dike. Herwiha ew bi berdewamî hewl dide ku hewldanên hêzên siyasî yên civakê parçe bike û di navbera wan de şerê navxweyî gur bike. Wekî din, ew hewl dide ku tovên gumanê di derbarê rewabûn û edaleta doza ku hêzên şoreşger hewl didin bi dest bixin de, biçîne.

**Rola sereke ya şerê taybet li ser kurdan**

Şerê taybet li ser Kurdan roleke stratejîk dilîze, di serî de jin û ciwanan hedef girtiye ku êrişî jinê dikin. Li kêleka wê her tim hewldanên vî şerî hebû ku gelê Kurd ji çand û zimanê wan dûr bixin, da ku nebin xwedî hişmendiyeke siyasî û hwd…Di pêvajoyên dawiyê de jî kesên rêbazên Şerê Taybet bikar tînin, bi rêya şerê derûnî, xwestin bidin nîşandan ku gelê Kurd bawer bikin, ew nikarin serbikevin. Lê her çiqasî ev rêbaz xwe pêş xistibe jî, gelê Kurd bi rêxistinbûn û perwerdeyan, êdî heya astekê ji lîstokên wisa xilas bûne.

**Tedbîrên pêwîst ên derbarê şerê taybet de werin girtin**

Gel di pêvajoyên pêşîlêgirtin de beşdar dibin.

Îdeolojî: Divê civak û takekes xwedî hêza rewşenbîrî bin, da ku bi xirabûnên ku di civaka mirovan de çêdibin re, rûbirûyî nemînin. Ji ber ku moderníteya kapîtalîst hemû rêbazên Şerê Taybet, nemaze sê rêbazên bingehîn bikar tîne. Li hemberî vê, divê mirov têkoşîna îdeolojîk a ku dikeve ser wê xurtir bike. Di heman demê de, divê mirov têgihîştinek kûr a dîrok û hêzê bi dest bixin, çand û exlaqî ya takekes û civakê pêş bixin, bi taybetî têkilî û nirxên civakî di nav civakê de geş bikin. Ya girîng divê hişmendiyek demokratîk a beşdarbûyî ku bi nirx û pîvanên pergala exlaqî ya jiyanek azad ve girêdayî, geş bikin. Li kêlek vê yekê gelek awayên din hene ku pêwîst e mirov bi rêya wan xwe ji Şerê Taybet ku bûye bela serê civakan xelas bikin.

FENER



Idrîs Henan

## Dema Ragihandin Bibe Amûreke Siyasetê, Xiyanetê Li Heqîqetê Dike


Ragihandin û lihevkirina neteweyî du stûnên bingehîn ên girêdayî hev in ku ragihandina bi bandor pireke yekirina vizyonên cuda û hişmendiya giştî li dora prensîbên bingehîn û dozên çarenûsî bi gewde dike. Lihevkirina neteweyî jî; çarçoveya bawerî, pabendiya bi perpirsiyariyên civakî ji ragihandinê re dabîn dike.
Di vê serdema nû de, ragihandin ne tenê amûreke veguhestin û pêşkêşkirina nûçeyan e, lê belê hêza bi bandor a şikidana hişmendiya kolektîf, avakirina raya giştî û rêvebirina rewşa siyasî, çandî û civakî di nav neteweyan de ye. Li vir girîngiya Çapemeniya Exlaqî xwe dide der ku tenê aliyê wê yê meslekî têrê nake mirov qala wê bike. Wê derbas dike û digihêje nirxên netewperwer, mirovî, piştgiriya dozên dadmen ên civakê û parastina yekîtiya gel û wijdanê hevbeş.
Çapemeniya bi sinc berî ku bibe pîşeyek, karsaziyek an jî platformek berjewendiyên kesane, berpirsiyariyek neteweyî ye. Gotin timî ne bêalîbûn e û bêdengiya li ser hin mijaran, dijatiya ji cewherê rastiyê re ye. Yanê; hinceta bêalîbûnê di dozên çarenûsî de dikare bibe revek exlaqî ya ji erk û berpirsiyariyên neteweyî û mirovî re.
Bêalîbûna rastîn nayê wê manê ku mirov di navbera rast û şaş de yek gav be. Ne jî serdest û bindetan yeksan bike. Çênabe êş û azarên gelan weke madeyên sar ên ragihandinê bibîne. Berovajî vê; bêalîbûna pîşeyî ew e ku; paralelî parastina pîvanên exlaqî û mirovî bi duristî vegotina rastiyê ye. Lê dema ku "bêalîbûn" bibe bergeke qezenca kesane, yan ji bo hinek hesabên oportonîzmê bêhelwestî be, wê çaxê ti maneya pîşeyî û exlaqî ya ragihandinê namîne.
Ji ber vê jî rista kûr a di navbera ragihandin û wijdan de weke têkîliyeke mirovbûyînê xwe dide der. Wijdan ne tenê sloganek were berzkirin e, lê belê hest û berpirsiyariya li beramberî gel, welat û dîrokê ye. Rojnamevanê xwedî wijdan, êş, azar û hêviyên gelê xwe hîs dike, pozisyona çavdêriyê red dike û xwe parçeyekî wê tabloyê dibîne. Gotarên nefret û cudaxwaziyê hezim nake, yekîtiya wijdanî ava dike û bi rola bingehîn a parastina tevna civakî radibe.
Ji xwe di bingeha wê zanîna wijdanî de ferqa navbera cudatiyên ramanî û dûrketina ji rêgez û prensîbên exlaqî û pîşeyî heye. Ango; mirov nikare ketinên exlaqî weke "nerîn" bigire dest. Tevî ku hewldan hene pênaseyek wisa lê bar bikin, lê di cewherê xwe de qulbandina rastiyan û di bin slogana azadiya ramanê de, çewsandina êşa civakê ye.
Rojnamegeriya bi sinc pêdiviyek neteweyî ne lûkseke ramanî ye. Sengera yekemîn a parastina hişmendî, nirx û yekîtiya civakê ye. Welat bi qelemên kirêgirtî û bêalîbûna derew ava nabe, lê belê bi çapemeniya xwedî wijdanê zindî û durist, baweriya bi heqîqetê û bi helwestên neteweyî ava dibe. Lê dema bibe amûreke siyasetê, cewherê xwe ji dest dide û xiyanetê li heqîqetê dike. Wê çaxê jî ti ferqa wê û çi aliyê sîtemkariyê rewa dike û hişmendiya civakê berovajî dike namîne. Ew jî ketina wijdanî ya şert û mercên exlaqî û netewperweriyê ye. Nerîna te ya siyasî çi dibe bila bibe, helwesta te ji rêveberiya heyî çi dibe bila bibe, tu ji kîjan saziya ragihandinê re kar dikî bike, lê divê li ser heqîqetê bazaran nekî û nebî amûrekî serdestiyê.



# Zindawerên çand û hunera Kurdî

Can Yûsiv

Helbestvan Yûsif Berazî; Bejnek wêjeyî ya bilind û berz, û fenerek afirîner a geş û ronak.
Helbestvan Yûsif Berazî yek ji sembolên herî diyar ên wêjeya Kurdî û yek ji stûnên helbesta klasîk tê dîtin, wî jiyana xwe û xîmava pênûsa xwe terxan kir bû ji bo xizmeta gelê xwe û doza wî, ew dengek bû ji bo nasnameyê diqêriya û şahidê serdemekê bû ku edebiyat li hemberî bêdengiyê rawestiya, da ku bimîne parêzvanê ziman û bîra Kurdî.
Helbestvanê Kurd Yûsif Elî Şêxo Berazî, bi nasnav (Bêbuhar), di sala 1931'an de ji dayîk û bavek Kurd (Elî û Xedîce) li gundê Til Cerciyê, li bakurê bajarê Babê li parêzgeha Helebê hatiye dinyayê, lê koka wî vedigere gundê Til Xezal yê girêdayî bajarê Kobanê ku bapîrên wî jê koçî herêma Babê kirin, ew di nava malbateke Kurdperwer û kedkar de mezin bû, ku ji çar birayan (Mihemed, Bîlal, Îsmaîl û Yûsif) û xwişkekî bi navê Emîna) pêk dihat, ew biçûkê birayên xwe bû .
Dê û bavên wan ew bi nirxên resen ên kurdewarî, dilsoziya bi welat û wefadariya bi nasnameya neteweyî re mezin kirin, di dilê wan de hezkirina axê, rastiya xwedîbûn û rêzgirtina peyvê çandin.
Yûsif Berazî li ser destê yek ji xizmên xwe ku navê wî Xelîl bû fêrî xwendin û nivîsandina bi zimanê erebî bû, paşê jî hînî zimanê dayika xwe Kurdî bû, herweha wî zimanê Tirkî jî baş dizanî, paşê bû helbestvanek xemê gelê xwe hilgirt û peyvê kire peyamek û helbest jî kire bîranînek zindî ku qet navemire.
Di sala 1947'an de tevî malbata xwe koçî bajarê Minbicê kir û piştre malbat di sala 1956'an de li bajarê Serê Kaniyê bi cih bû.
Li wir, Yûsif saloneke berberiyê vekir, ku ne tenê cihê debara jiyanê bû, lê bû cihêkî zindî ji bo gotûbêjên ramyarî û siyasî, û minberek ji bo guhertina raman û xemên neteweyî.
Vê çalakiya çandî û civakî ew kir cihê baldariya hêzên desthilatdariyê û ew xiste ber çavdêriya domdar ji aliyê dezgehên ewlehiyê ku di wê demê de hişmendî wek sûc dihat dîtin û peyv wek kiryarekî berxwedana bêdeng bû.
Meyla wî ya hunerî, hezkirina wî ya ji bo stran û muzîk û helbesta Kurdî di temenekî biçûk de dest pê kir, di bin bandora stranên destanî û folklora kurdî ya dewlemend a ji asta hunerî û bedewiyê ve.
Ev mîrateya bihîstinî û helbestî ya destpêkê, bû bingeha yekem a hişmendiya afirîner a wî, û kilîla têketina wî ya nav cîhana peyv û awazê.
Yûsif Berazî di warê helbest û mûzîkê de pir şehreza bû , bi xwendina dîwanên helbestvanên mezin ên wek Melayê Cezîrî, Ehmedê Xanî, Şîrazî, Fîrdewsî û yên din, wî bedewiya helbesta kevneşopî girt û ji mîrateya wan a zimanî û ramyarî fêr bû, û di heman demê de zanyariya wî ya rast û kûr hebû di warê deryayên helbestî û pêlawazên wan de , evê yekê hêzek da ezmûna wî ku di navbera resenî û hişmendiya hunerî de hevsengiyekê çêbike, û him di navbera kelepûr û



nûjeniyê de pêwendiyekê ava bike, û helbestê bike berdewamiya zindî ya bîranîna hunerî ya rakûr.

Destpêka rêwîtiya wî ya hunerî ji muzîkê dest pê kir , wî li alavên muzîkî yên kurdî wek bilûr û tambûrê dixist, û demekê wî wek sazvan û bestekar berdewam kir, berî ku riya xwe ya kûr û berfireh di helbestê de bibîne. Di wê qonaxê de, wî helbestên xwe bi awaz kirin , hevahengîyek di navbera peyv û awazê de çêkir, û di heman demê de dîtina xwe ya hunerî û neteweyî bi hev re îfade kir.
Di destpêka rêwîtiya xwe ya wêjeyî de, ketibû di bin bandora nifşê helbestvanên Kurd ê serdema xwe de, bi taybetî jî helbestvanê nemir Cegerxwîn, ku wî wek mamoste û rêber ji xwe re didît ,û ew teşwîqî nivîsandina helbestê kir, vê yekê bandorek kûr li ser pêşxistina jêhatîbûna wî û xurtkirina ezmûna wî ya klasîk kir. Her weha bandora kesayetiya edebî û siyasî ya Osman Sabri jî pir lê bû , wî ew wek nimûne û pêşeng ji xwe re didît.
Di bîst û pênc saliya xwe de li ber destê nivîskar û zimanzanê Kurd Reşîd Kurd fêrî rêzikên zimanê kurdî , pêlawaz û kêşeyên helbesta Kurdî bû, ev zanîn û fêrbûn bingeha xurt a rêwîtiya wî ya wêjeyî ya paşerojê ava kir, û di bilindkirina cihê wî de wek helbestvanekî jêhatî roleke girîng lîst.
Yûsif Berazî di sala 1963'an de bi Qadriya xanim re dizewice û şeş zarok ji wan re çêdibin, du kur (Xusro û Behram) û çar keç (Jîna, Nazdar, Ahîn û Nîgar) ,bi wî re malbateke xurt ava kirin, piştgirî dan karê wî yê edebî û hunerî.
Yûsif Berazî ji destpêka xortaniya xwe ve di nava refên tevgera siyasî ya netewî ya Kurd de têkoşiya, di sala 1960'an de tevlî refên Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê ( El-Partî) dibe.
Di heman salê de bi birayê xwe Îsmaîl Berazî re yekemîn rêxistina partiyê li bajarê Serê Kaniyê damezirand ,ku bû destpêkek ji bo xebata wî ya siyasî û neteweyî di wê qonaxa hestiyar de.
Di encama çalakî û helwestên wî yên neteweyî yên bi wêrekî de,ew çend caran di salên 1962, 1966, 1970 û 1975'an de hat girtin, lê baweriya wî bi rêbaz û ramanên Barzanî bû ronahiyek ji jiyana wî re, ev yek di exlaq û têkoşîna wî de diyar bû.
Di sala 1966'an de di gel birayê xwe Îsmaîl, tevî tekoşerên mîna Hemze Nûyran , Bobo Kinê û Xalid Daşî yên ji bajarê Serê Kaniyê, di çarçoveya kampanyayeke berfireh a ji bo armancgirtina kesayetên tevgera Kurdî de, hatin girtin. Di wê demê de jî hejmarek ji têkoşeran hatin girtin, di nav wan de Dihamê Mîro, Ebdul Hamîd Derwêş, Kenan Egîd û Mecîd Haco û yên din jî hebûn.
Di zindanê de, Yûsif Barazî helbesta xwe ya navdar "Hebs û Zindan " li ser dîwarên girtîgehê nivîsî, û tê de êş û janên xwe diyar kir û sekna xwe ya giyanî û hêza biryardariya xwe îfade kir.
Helbestvan Yûsif Berazî hemû rengên helbesta kurdî nivîsandiye, ji helbesta kilasîk ya terazû ya bi kêşe û rêzbend, heta bigihê helbesta nûjen , azad û pexşan nivîsîye.
Wî pênc dîwanên helbestan bi zimanê kurdî çap kirin:
1-Zindan- sala 1988
2- Bang - sala 1997
3- Raperîn - sala 2002
4- Serxwebûn- sala 2006.
5- Pêşketin - sala 2007
Herwiha çend berhemên wî yên ku ronahiyê nedîtine, wek:
1-Pirtûkek bi navê "Pendên felsefeya kurdî" ji du beşan.
2- Ferhenga Kurdî-Erebî.
3- Sê dîwanên helbestan ji bo çapê amade ne, ji wan: (Serkeftin, Azadî û Aramî).
Ev berhem û karên wî cihê pirrengiya ezmûna wî ya afirîner nîşan didin, û jêhatîbûna wî di hevgirtina mîrateya klasîk û hişmendiya nûjen de diyar dikin, ku di navbera huner û helwesta neteweyî ya berxwedêr de hevsengiyek çêdike.
Helbestên wî mijarên cûrbecûr digirin nav xwe, wî li ser welat û xerîbiyê , li ser Kurdistan û bedewiya wê, li ser şoreş û pêşengên wê, li ser xweza û bedewiyê nivîsîye, her wiha wî li ser evîn û hezkirinê, û li ser azadî û rûmetê helbest nivîsîne.
Şarezayiya wî tenê bi nivîsandina helbestê re sînordar nema , ew di heman demê de sazvan, bestekar û dengbêjek bû, xwedî dengek germ û hestiyariyeke nazik bû, ku ew kir beşekî bingehîn ji dîmena muzîka kurdî.
Bi giştî hejmara helbestên ku ji gotin û awazên wî hatine gotin, gihişte 54 stranan û gelek hunermendên Kurd ew strandine , ji stranên wî yên herî navdar :
1- Habs û Zindan
2- Rabe ji Xewê
3- Derdan çi ez dil jarkirim .
4- Gulîzar Şînbû Rîhan
5- Ey Bilbilê Dilşadî (Gotin: Sidayê Tîrêj)
6- Pervîn Keç nûgihişti (Gotin: Omar Lalê)
Di van berheman de têkeliyeke bêhempa ya helbest, stran û muzîkê pêk dihat, û bûn dengvedanek zindî ya hest û hişmendiya gelê kurd, û bangek hunerî ku debirîna nasname, girêdan û azadî dike.
Yûsif Barazî helbestên klasîk ên bi kêşe û rêzbend nivîsandine , ev yek bû sedema baldarî ya hemû hunermendên kurd ku gotinên helbestên wî
bikin awaz û bi strînin.
Helbest wî jî ji aliyê gelek hunermendên mezin ên kurdên Rojava hatine strandin.
Ji nav wan , hunermend Mihemed Şêxo gelek stran û helbestên wî gotine , mîna:
1- Hebs û zindan
2- Ez bûm Firar
3- Rabe ji xew
4-Eman eman
5- Derdan çi diljar kirim.
6- Welat welat
7- Eman dilo
Di heman demê de hunermend Mehmûd Ezîz Şakir jî gelek gotine wek :
1- Hebs û zindan
2- Were were
3- Gulîzarê
4- Eman dilo
5- Şêrîn tu cîrana minî.
Her wiha Hunermend Seîd Gabarî jî ji helbestên wî gotine wek:
1- Koçê me barkir
2- Hat xweş buhar
3- Bê bext Felak
4- Di tariyê de.
Herwiha jî çend hunermendên din ên kurd jî ji helbestên wî stran gotine, wek Zubêr Salih, Husên Salih, Mistefa Xalid û hwd.
Yûsif Berazî ne tenê nivîskar û helbestvan bû, lê semboleke neteweyî û çiraxeke geş bû li ser riyên çanda kurdî , wî peyv kir helwest, helbest jî kir amûra parastina mîrat û nasnameyê.
Helbestvan Bêbuhar di 15'ê Çileya 2009'an de, piştî têkoşîneke dirêj a bi nexweşiyê re, di heftê û heft saliya xwe de, bê deng koça dawî kir, û li bajarê Serêkaniyê, di merasîmeke bi heybet, bi beşdarbûna hezkirî û hevalên wî, hate oxirkirin.
Wekî rêzgirtin ji bo bîranîna wî ya nemir re, rêhevalên wî komeleyek çandî bi navê wî li bajarê Amûdê damezrandin, her weha, ofîsa Partiya Demokrat a Kurdî li Sûriyê li Hesekê li ser navê wî binavkirin , wek rûmetek ji kar û xebat û têkoşîna wî re. Herwiha dezgeha Rudaw berhemên wî yên helbestî yên giştî di du cildan de çap kir, da ku mîrateya wî ya wêjeyî her dem di nav nifşan de bimîne.
Wî herwiha xelata sedsaliya helbestvanê kurd Cegerxwîn wergirt, wek pênasîndek ji cihê wî yê wêjeyî û ramyarî , û beşdarbûna wî di parastina zimanê kurdî û xurtkirina nasnameya neteweyî de.
Bi çûyîna wî re neteweya Kurd yek ji stûnên wêjeya Kurdî winda kir û stûnek çandî ya ku bi gotinan hişmendiyek sazkir, bi helbestê re bîranînek afirand, û bi helwêstê re hebûnek naye cîgirtin ava kir.
Yûsif Barazî li paş xwe mîrateyek edebî ya dewlemend hişt, ku tijî ji jiyan û peyva rast,wî pirtûkxaneya wêjeya kurdî bi xezîneyên wate û nîşaneyên dewlemend kir,wî şopeke mayînde li ser wijdana nifşên paşerojê hişt û gelek helbestvanên kurd ji kaniyên wî yên wêjeyî û çandî vexwartine û ji serpêhatiya wî , hişmendiya peyvê û rastiya xweparêziyê îlham girtine.
Wê her dem wek stêrkek ronîdar di ezmanê wêjeya kurdî de bimîne, û wek Kaniyek ku qet namiçiqe û mîna buharek ji helbestan qet naçilmise ,ku ruhê peyvê nû dike, bîrdankê zindî dihêle, û ji nifşan re wateya xwedîbûn û bedewiya mayînê vediguhêze.
Ji ruhê wî yê pak re, rûmet û mandarî.
Û ji têkoşîna wî, mîrasa wî ya wêjeyî û çandî mayînde û domdarî.



Remezan Olçen

## Berhevkirina zargotinê

Zargotina kurdî, weke deryayekê, weke okyanûseke bêbinî ye. Ji ber ku kurdî bi salan zimanê nivîskî yê fermî û perwerdeyê nebû ji ber wê jî hafizeya civakê bûye pirtûkxaneya herî mezin. Lê ev pirtûkxane zindî ye, dema ku kalek an dapîrek dimre, wekî ku pirtûkxaneyek bişewite, tine bibe. Ji ber vê yekê, berhevkariya zargotinê ango komkirina çîrok, kilam, metelok û hwd ji bo kurdî ne tenê xebateke akademîk e, xebateke man û nemanê ye.
Xebatên berhevkariya zargotina kurdî di sê qonaxên sereke de meşiyane ku her yekê reng û şêwazekî cuda daye vê dewlemendiyê.
Berhevkarên pêşîn ne kurd bûn, lê zanyar û dîplomatên biyanî bûn weke Rûs, Alman û Fransî. Kesên wekî Albert Socin, Peter Lerch û Alexandre Jaba hatine Kurdistanê û çîrok û kilamên kurmancî qeyd kirin. Armanca wan fêmkirina ziman û çanda kurdan bû, lê wan bingehekî girîng ê nivîskî li pey xwe hişt.
Di sedsala 20'ê de ku weke jenerasyona duyem jî mirov diare bi nav bike, di parastina zargotina kurmanciyê de gava her herî mezin li Ermenistanê, li herêma Rewanê hat avêtin. Di serokatiya Heciyê Cindî, Emînê Evdal û piştre jî birayên navdar Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl de, gund bi gundê kurmancan geriyane. Wan bi hezaran rûpel çîrok, metelok û kilamên kurmancî berhev kirin û wekî pirtûk çap kirin. Radyoya Rewanê jî bû arşîva herî mezin a zargotina zindî.
Îro êdî berhevkariya kurmanciyê ketiye qonaxeke nû. Bi riya înternet, qeydkirina deng û vîdyoyan, gelek lêkolînerên ciwan, mamoste û saziyên çandî li Bakur, Başûr û Rojavayê Kurdistanê çîrok û folklorê qeyd dikin. Êdî berhevkarî ne tenê karê akademîsyenan e, karê her kurdekî/ê xwedî xîret e.
Dema ku em çîrok an kilameke kurmancî berhev dikin, em dibînin ku sê taybetmendiyên wê yên pir xurt hene. Rola Dengbêjiyê; Di kurmanciyê de zargotin ne tenê tê gotin, tê strandin jî. Dengbêjî, şêwazê herî bilind ê zargotina kurmancî ye. Destanên wekî Kela Dimdim, Dewrêşê Evdî û Memê Alan bi riya dengbêjan gihiştine îro. Zengîniya Zarava û Herêmî: Zargotina Serhedê, ya Botanê, ya Bahdînanê yan jî ya Torê hinekî ji hev cuda ne. Berhevkarekî zargotinê dema diçe herêmekê, ne tenê çîrokê, lê devoka wê herêmê jî qeyd dike. Bandora Erdnîgariyê: Çîrok û kilamên kurmancî tije ne ji navên çiya, zozan, pez, hesp û xwezayê. Ev nîşan dide ku zargotina kurmancî rasterast ji jiyana koçerî û gundîtiyê ya li ser çiyayên Kurdistanê hatiye girtin.
Li aliyê din divê were gotin ku berhevkariya zargotina kurmanciyê tu carî hêsan nebûye. Berhevkar her tim bi van sê astengiyên mezin re rûbirû mane: Qedexeyên Siyasî û Zimanî: Ji ber qedexeya li ser zimanê kurdî, bi salan berhevkar nekarîne bi awayekî azad herin gundan û deng qeyd bikin. Gelek arşîv hatin şewitandin û windakirin. Koçberî û Modernîzm: Jiyana gundewarî her ku diçe namîne. Televîzyon û telefon ketin malan û çanda guhdarîkirina çîrokên şevan qut bû. Mirovên kal û pîr koçî bajaran kirin û li bajaran ew zargotin hêdî hêdî hat jibîrkirin. Pirsgirêka Standardkirinê: Dema çîrokek tê berhevkirin, pirs ev e: Gelo divê wekî ku ji devê îcraker derketiye were nivîsandin, an bi kurmanciya standard? Lêkolînerên nûjen dibêjin divê wekî xwe were parastin daku dewlemendiya zimên winda nebe.
Berhevkariya zargotina kurmanciyê, ne tenê berhevkirina rabirdûyê ye, ew avakirina paşerojê ye. Heke îro nivîskarên kurd dikarin bi kurmancî roman, çîrok û helbestên nûjen binivîsin, ev yek bi xêra wan pevgotin, metelok û ferhenga dewlemend a zargotinê ye ku hatiye parastin. Ji ebr wê jî ji duh bêhtir îro dive em vî karê bigirin se rmilê xw eû bikin.

# ‘Buhayê genim ne li gorî lêçûnên çandiniyê ye’

Cotkar û xwediyên patozan diyar kirin ku ji ber bilindbûna buhayên pêwistiyên çandiniyê û buhayê genim ku hikumeta demkî destnîşan kiriye, ew ê ziyaneke mezin bibînin û gotin, “Buhayê genim ku hikumetê destnîşan kiriye, ne li gorî lêçûna çandiniyê ye.”

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Nerazîbûnek berfireh di nav cotkar û karkerên çandiniyê derbarê buhayê kirîna berhema genim a sala 2026’an de de derket holê. Hikumeta demkî ya Sûriyê buhayê nû ji bo her tonekî genim 46 hezarên lîreyên Sûrî ya nû diyar kir ye.

Cotkar dibînin ku buhayên nû bi 330 dolarî ji bo her tonekî derbas nake, ev yek jî li gorî buhayê demsala borî pir kêm e, ji ber ku ew bi bilindbûna mezin a lêçûnên hilberîna çandiniyê re, di nav de tov, gubre, sotemenî, mûçeyên cotkariyê û parastina erdê re li hev nayê.

Hejmarek ji cotkarên herêma Cezîrê piştrast kirin ku hemû pêdiviyên çandiniyê, tevî mazotê, bi dolarên Amerîkî têne firotin, di heman demê de nirx û pereyê genim bi lîreyên Sûrî tê destnîşankirin, ku ev yek barê darayî yê li ser cotkaran du qat zêde dike.

### ‘Gerek buhayê genim bilindtir bibe’

Li gundê Hidêdîka yê girêdayî bajarê Qamişlo cotkarê bi navê Emîn Xalid li ser lêçûna çandiniyê bi giştî û dijwariyên ku cotkar pê re di rû bi rû dimînin, ji Rojnameya me re axivî û wiha got: “Vê salê buhayê tovan û gubreyê pir bilind bû, lewma bi awayekî neynî bandor li ser me kir, me tona tovan nêzî bi 350 dolarî bû, heriwha gubre her tonek 650 dolarî.”

Cotkar Emîn Xalid bal kişand li ser buhayê genim û wiha got: “Buhayê nû yên genim pir xisarê ji me re tîne, ew ne li gorî lêçûna ku me li çandiniya îsal daye, buhayê Genim ku hatiye pejirandin ne gunvac e û ne li gorî lêçûnên hilberînê, em dixwazin ku buhayê genim bilind bibe ku di navbera 500 heta 600 dolarî be. Cotkar bi giştî xwe dispêrin çandiniyê û ji bilî wê tu dahatên wan tune ye, bi vî awayî pir zirar dighêje me û eger buha wisa bimîne tu sûdê em ê jê negirin, tenê lêçûna ku me lê daye em ê derxînin. Hêviya me ku piştgirî ji bo cotkaran bê dayîn. Di heman demê de jî mazot ji bo me bê diyar kirin, ji ber ku nebûna diyarkirina buhayê mazotê ji cotkaran re aloziyekê din çêdike.”


Emîn Xalid

### ‘Gerek pêwistiyên çandiniyê bi buhayê guncav werin dabînkirin’

Emîn Xalid axaftina xwe wiha qedand: “Ev biryar bi taybetî ji bo cotkarên li kantona Cizîrê gelek metirsiyan bi xwe re tîne, ji ber ku nêzîkî nîvê berhema genim a Sûriyê hildiberîne, buhayê genim yê heyî ne li gorî lêçûnên hilberînê ye, rêjeyên enflasyonê, an jî buhayên zêde yên kelûpelan e.Ev buha dê zirarên mezin bide cotkaran û şiyana wan a ji bo berdewamkirina çandina berhemên stratejîk di demsalên pêş de qels dike. Dê ev yek bandorên neyînî yên li ser ewlehiya xwarinê û aramiya aborî û civakî ya welêt bike.”


Ehmed Nayif

Di heman mijarê de cotkarê bi navê Ehmed Nayif ku ji gundê Gêta yê girêdayî bajarê Qamişlo jî ji me nerazîbûna xwe li hember buhayê genim nîşan da û wiha got: “Her toneke tov bi 650 dolarî ye, semad her tonek bi 650 dolarî, ji bilî lêçûnên avdan û çinînê. Em daxwaz dikin ku buhayê genim bê bilindkirin ku di navbera 500 heta 600 dolarî ji bo her tonekî be. Lêçûna her toneke genim bi giştî dê bighêje 750 dolarî, ka em ê çawa bi vê buhayê qezencên çandiniyê bidest bixin. Hemû pêwistiyên çandiniyê me bi deyn aniye, em neçrin ku genimê xwe bifroşin, eger ne bi deyn ba min genim ne difroşt.”

Cotkar Ehmed Nayif wiha gotina xwe qedand: “Zehmetiyên ku li hember me derdikevin, bilindbûna mazotê bû, guber û genim buha bû, divê hemû saziyên girêdayî çandiniyê piştgiriyê bidin cotkaran û van pêwistiyan bi buhayeke guncav ji cotkar re bêne firotin.”


Serhan Xalid

### Amadekariyên xwediyên patozan

Di van deman de ber bi nêzîkbûna çinînê, xwediyên patozan jî amadekariyên sererastkirin û lênerîna patozên xwe temem kirine û li bende ne ku herin ji bo çinînê. Demsala çandiniya îsal bi saya barana zêde demsaleke bi serkeftî bi xwe re anî, lê ji ber buhabûna pêwistiyên wê ji destpêka çandiniyê em bigrin dest heya çûna patozan li ser erdan, dê cotkar hem jî xwediyên patozan bi windahiyan rû bi rû mane.

Tevî ku demsala çandiniya îsal bi xêr û berket e, lê buhabûna mazotê bandoreke mezin li ser xwediyên patozan hem jî li ser cotkaran çêkiriye û her du alî xisarê di vî derbarî dê bibînin.

Xwediyek deraseyê ku ji gundê Hidêdîka ye li gundewarê Qamişlo ye, Serhan Xalid li ser amadekariyê çinînê, zehmetî û dijwariyên ku li hember wan derdikeve, bi taybet bandora buhabûna mazotê li ser wan ji Rojnameya me re wiha anî ziman: “Vê salê sererastkirin û lênerîna patozan gihaşt 5 hezar dolarî, ev yek jî li gorî xirabûna ku dighêje patozan tê xwestin, sala borî tenê gihaşt 2 hezar dolarî.”

Li gorî xwediyê patozan, karkerên ku lênerîna patozan dike destnîşan dikin ku ev buhabûn ji ber bilindbûna nirêx mazotê ye herwiha li gorî parçeyên ku pêwîst be ji bo patozan. Pirsgirêka buhabûna mazotê dibe sedem ku lêçûnên sererastkirin û lênerîna patozan jî bilind bibe ku rasterast bandorê li ser cotkar û xwediyên patozan dide.

### Heqdestê karkeran

Serhan Dirê’î Xalid bal kişand li ser heqdestên karkeran û wiha ji me re anî ziman: “Ajokar sala borî 300 dolar dixwest, lê îsla daxwaza 1000 heta 1000 û 200 dolarî dike, terzîkarên patozan 300 dolar dixwazin, sala borî 150 dolar dixwestin. Yên ku xwarinê ji me re amade dikin her yek ji 300 heta 400 dixwazin. Lêçûna sererastkirin û heq destê van karkeran dighêje 10 hezar dolarî. Ji bilî buhaya mazotê dê bighêje nêzî bi 4 hezar dolarî. Lewma dibe ku em ji serê 100 çewalî 20 heya 15 çewalan bixwazin, sala borî tenê 7 çewal me dixwest, yanî her donimek bi 150 dolarî, sala borî 27 dolar me dixwest.”

Di dawî de xwediyê deraseyê Serhan Dirê’î Xalid hêviyên xwe anî ziman ku piştgirî ji bo wan bê kirin herwiha di aliyê dabînkirina mazotê de buhayeke guncav bê diyar kirin.

# Bi nêzîkbûna Cejna Qurbanê tevger li bazara bajarê Qamişlo lawaz e

**Solîn Mihemed/ Qamişlo**

**Tevî nêzîkbûna Cejna Qurbanê jî, tevgera welatiyan di nava bazara bajarê Qamişlo de li gorî salên borî kêm e. Firoşkarên bazarê jî diyar kirin ku ji buhaya zêde asta kirînê pir lawaz e.**

Cejina Qurbanê yek ji pîrozbahiyên herî mezin ên ola Islamê ne ye ku di roja dehemîn a meha Zîlhîceyê de dest pê dike û çar rojan berdewam dike. Ev cejin li cem misilmanan sembola fedakariyê ye û bi merasîmên hecê, qurbankirina sewlan û xêrxwaziyê tê pîroz kirin.

Her sal bi nêzîkbûna cejna Qurbanê welatiyên bajarê Qamişlo berê xwe didin bazaran da ku şekir, çil , goşt û pêdiviyên cejnê bikirin. Lê îsal ji ber buhaya zêde welatî nikarin pêdiviyên cejnê bidest bixin û tevgera li bazara Qamişlo li gorî salên derbasbûyî pir kêm e.

Li ser madekariyên cejan Qurbanê û buhabûna li bazarê, Welatî û firoşkarên bajarê Qamişlo ji Rojnameya me re axivîn.


Fener Omer

### Bi hatina cejina Qurbanê buhabûn bare welatiyan giran dike’

Welatiyê bi navê Fener Omer diyar kir cejna Qurbanê nêz bûye lê wan heya niha ji ber buhabûnê tiştek nekirîne û wiha got: “Roja cejina Qurbanê nêz bû, lê heya niha me cil û şekir ji ber buhabûnê nekiriye. Kîloya şekir bi 35’ hezarî û bi jor de ye, ev yek ji welatiyên xizan re zehmete. Di heman demê de cil, sebe û goşt jîpi buhaye. Ev yek jî bare welatiyan giran dike.”

### ‘Tevgera welatiyan ji kirîna şekir re kêm e’

Firoşkarên şekir Mihemed Mensûr diyarkirin ku ji ber bihabûnê kirîna şekir re pir kêm e û wiha got: “Buhayê şerkirê cejinê ji ber bilindbûna dolar pi zêde ye. Buhayên şekir yên cejina remezanê ji buhayên vê cejinê kêmtir bûn. Îro kîloya şekir ji 35’an û bi jor de ye, ji ber vê yekê çûn û hatina welatiyan pir kêm e. Her ku dolar bilind dibe şerkir jî bilind dibe, ev yek dihêle ku welatî kêm şekir bikirin û cejina xwe bikin.”


Mihemed Mensûr

### Buhabûna cilan

Firoşgehê cilan Daûd Bozo da xuyakirin ku di cejina Qurbanê de ya herî girîng cilên zarokan ne û wiha got: “Di cejinên borî de buhayên cilan hinekî kêm bûn, lê ji ber girtina dergehan pir zehmetî derdikevin da ku cil bigihêjin me, ji ber vê yekê her cilek 5 dolar hatiye ser. Niha herî zêde cilên zarokan buha ne ji ber ku ji derve tên. Çûn û hatina welatiyan ji bo cejina Qurbanê ji dikanên me re pir kêm e. Welatî neçarin ku li cihên erzan bigerin da ku ji zarokên xwe re bikirin, ji ber di cejinan de ya herî girîng kêfxweşiya zarokan e.”


Daûd Bozo

### ‘Her tim buhayên sebzeyan tê guherin’

Xwediyê firoşgeha sebzeyan Ebd Salim diyar kir ku her tim buhayên sebezeyan tên guhertin û wiha anî ziman: “Sebze bi giştî li bazara bajarê Qamişlo buha bûne. Ev demeke çûn û hatina welatiyan ji bazara sebzeyan re kêm e, her ku tişt buha dibin serdana welatiyan ji kirîna sebzeyan re jî kêmtir dibe. ji ber rewşa aborî ya zehmet welatî berê xwe didin kirîna tiştên sereke yên wekî şekir û cilan.”


Ebid Salim

### Buhabûnên Goşt

Firoşkarê goşt Mihemed Ebdullezîz jî diyar kir ku ya herî girîng di cejinê de goşt e û wiha anî ziman: “Herî zêde di vê cejinê de goştê pez ji bo qurbaniyan buha bûye. Di dema berê de buhayên goştê çêlekan erzan bû, lê niha ji ber cejinê bi 130 hezarî tê firoştin, herwiha goştê golikan bi 150 hezarî ye, yê pez jî bi 120’an û bi jor de tê firotin.”



# ‘Pêşxistina siyaseta navendî li hemberî demokrasiyê kûrkirina pirsgirêkan e’

Endama Ofîsa Têkiliyên PYD’ê Îlham Mihemed û Sekreterê Partiya Roj a Demokratîk a Kurd li Sûriyê Kovan Keno diyar kirin ku ji ber pêşxistina siyaseta navendî li hemberî demokrasiyê, heya roja îro pirsgirêkên mirovan çareser nabin û gotin, “Demokrasî pêk neyê, wê pirsgirêk bidomin, kirîz kûrtir bibin û şerên nû derkevin.”

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Bi dirêjahiya dîrokê heta roja me ya îro, gelek sîstem bi gelek awayan hatin avakirin. Lê ji dîrokê heya niha sîstemên ku bi hev re di nava pevçûnan de ne û xwe didomînin, “Sîstema navendî û sîstema demokratîk e.” Sîstema demokratîk; li gorî rastiyên jiyana destpêkê ew di wê serdemê de bi awayekî rast dihate bikaranîn, ji ber civakbûyîna ku li dora jinê xwe ava kir, tê de wekhevî, yekîtî, dadmendî û hwd… hebû, ew têgîn me anîn ziman jî, xwe li derdora demokrasiyê kom dikin û dihewînin. Lê dema çînayetê yan jî desthilatdarî derbasî dîrokê bû, têgîna navendî derkete holê. Sîstema navendî riyên pevçûn û şeran ava kir, berjewendî li pêş derxist ku encamên wê bi roja me ya îro herî zêde di Rojhilata Navîn û dewletên heyî re xuyayî dibe. Her çiqasî temenê navendîbûnê dirêj dibe, ewqasî kirîz kurtir dibin, şerên nû ava dibin û nakokî berdewam dibin. Lê di her dem û gavê de çareserî ya bidawîbûna hemû pirsgirêkan di demokrasiyê de, peyda dibe. Lê bi hewldanên dûrxistina demokrasiyê li ser mirovan, çareseriyên rastîn peyda nabin. Di dema niha de jî desthilatdar bi hemû hewldanan sîstema navendîbûnê diparêzin û rê nadin sîstemeke demokratîk li pêş bike. Mînaka wê ya herî zêde têkoşîna Kurdan a ji bo demokrasiyê ku li hemberî wê dewletên hegemon ên navendî dibin kelem. Avabûna Partiyên Karkerên Kurdistanê PKK’ê, lidarxistina şoreşên Kurdan, bi taybet Şoreşa Rojava, li ser sîstema demokratîk e. Lê her kes dibîne, zêdeyî 50 salan şer li hemberî PKK’ê tê kirin, da ku ne tenê weke tevger, lê weke hizir jî tune bibe, ji ber hizrekî demokraîtke dihewîne. Herwiha plana têkçûna Şoreşa Rojava ku ew jî heman hizrê vedihewîne “pêkanîna demokrasiyê” tên kirin û gelek plan hatin meşandin jî, lê bi armanc nebûn. Ji ber koka tevger û şoreşê civak bi xwe ne.

Derbarê siyaseta navendî û siyaseta demokratîk, bi taybetî bikaranîna siyaseta navnedî li ser Kurdan li Sûriyê, endama Ofîsa Têkiliyên Partiya Yekîtiya Demokrat PYD’ê Îlham Mihemed û Sekreterê Partiya Roj a Demokratîk a Kurd li Sûriyê Kovan Keno ji Rojnameya me re axivîn.

### ‘Dema demokrasî tune be, pirsgirêk kurtir dibin’

Îlham Mihemed diyar kir ku di destpêka dîrokê de civak bi rengekî demokratîk dijiya û wiha got: “Derbarê siyasetên heyî de, mirov dixwaze hinekî ji dîrokê ve bîne ziman. Dema em behsa civakê dikin, civak bi xwezayî û bi rengekî demokratîk bi hev re dijiya, heta demekê pirsgirêkên civakê tune bû. Lê dema ku desthilatdarî an jî desthilatdariyên herêmî dest pê kirin, ew siyaseta demokratîk hêdî hêdî winda bû û li şûna wê siyasetek navendî derket holê. Ev siyaseta navendî serweriya xwe li ser civakê ava kir û armancên xwe pêşxist; wekî aliyên siyasî, aborî, civakî û hwd…. Desthilatdarî jî her tim dixwaze serwerî û kontrola xwe li ser civakê bi hêz bike, civak dike kole û siyaseta koletiyê li ser civakê dimeşîne. Ji ber vê yekê jî pirsgirêkên civakê dest pê dikin. Li ser vê yekê em dikarin bêjin ku dema demokrasî tune be, pirsgirêk bingehîn û firehtir dibin. Di serî de jî, dema ku rola jinê têk diçe û paşguh dibe, demokrasî nikare bi awayekî rast pêk were. Ji ber ku demokrasî bi yek alî çênabe, ew bi her du aliyan û bi tevahiya pêkhateya civakê pêk tê, rola jinê jî ya bingehîne. Heta peyva “demokrasî” jî gelek caran ji aliyê navendîbûn û zihniyeta çînayetiyê ve tê bikaranîn, da ku hemû beşên civakê bixin bin xizmeta xwe de û desthilatdariya xwe li ser wê bi bidomînin. Ev sîstem bi hezarên salan e ku tê meşandin, lewma pirsgirêkên civakê her ku diçe kurtir û zêdetir dibin û nayên çareserkirin. Ji ber ku her tim nakokî û pevçûn di navbera civak û navendîbûnê de heye. Ew pevçûn ji bo bilindkirina deng û rola civakê li hemberî dewletên navendî ye, yên ku civakê ji bo berjewendiyên xwe bikar tînin. Xeta berxwedanê û xeta navendîbûnê bi berdewamî di nava pevçûnê de ne û ev pevçûn heta roja îro jî berdewam e.”



### ‘Şoreşên gelan li hemberî navendîbûnê, dê berdewam bin’

Îlham Mihemed eşkere kir ku heya demokrasî pêk neyê wê şoreşên gelan berdewam bin û wiha pê de çû: “Şoreşên ku hatin lidarxistin û olên ku derketin, ji bo sererastkirinê nebûn çareserî. Her çiqas zanyar û feylesûf derketin û gelek teorî ji bo çareserkirinê hatin avakirin, dîsa jî ne têrker bûn û nikarîn bibin çareseriya rastîn. Ji ber şerên ku derketin hewl didan hişmendiya xwe li ser civakê bimeşînin. Wek şerê cîhanê yê yekem, duyem û niha jî yê sêyemîn ku tê meşandin, her tim xwestine civakê parçe bikin û bixînin bin xizmeta xwe de, da ku armancên xwe pêk bînin. Armanca wan jî birêvebirina giştî ya civakê û binpêkirina wê ye. Di aliyê din de jî, şoreşên ku hatine lidarxistin, ji bingehê civakê derketine, da ku reng û dengê civakê bilind bikin û li dijî vê koletiya ku li ser gel û civakê tê meşandin rawestin. Ew li hemberî desthilatdariyên mezin, bi taybetî li dijî navendîbûnê, derdikevin. Heya ku demokrasî pêk neyê û bi rastî neyê meşandin, ev şoreş dê berdewam bin.”

### ‘Desthilatdaran peyva demokrasî ji wateya wê derxistine û li gorî xwe bikar tînin’

Îlham Mihemed peyva demokrasiyê wiha rave kir: “Dema em behsa demokrasiyê dikin, ew ne tenê peyvek e, lê wateya wekhevî û yekrêziya civakê dide û hevsengiya civakê pêk tîne. Lê sîstemên ku derketine, ev peyv ji wateya wê derxistine û li gorî berjewendiyên xwe wê bikar tînin. Demokrasiya rast, ew nenavendîbûna ku di nava civakê de tê meşandin e ku dikare pirsgirêkên civakê ji bingehîn ve çareser bike. Lewra, heya ku nenavendî neyê meşandin, çareseriyên rast ji bo pirsgirêkên civakê nayên dîtin û hevsengî di nava civakê de pêk nayê.”


Îlham Mihemed

### ‘Gelê Kurd ne hizkiriyê desthilatdariyê ne, hizkiriyê demokrasiyê ne’

Îlham Mihemed tekez kir ku gele êdî nema qebûl dike ku dengê wan bê çewisandin û wiha anî ziman: “Di zêdeyî 12 salên Şoreşa Rojava û Şoreşa Sûriyê de, fersendek zêrîn ji civakê re, bi taybetî ji gelê Kurd re, hatibû çêkirin. Ji ber ku gelê Kurd nebûye navendî û ew hezkiriyê demokratiyet û nenavendîbûn e, her tim jî nexwastiye desthilatdariyê bike û vê desthilatdariyê li ser civakê bimeşîne, li asta wekheviya civakê rawestiye. Ji ber vê yekê, dema em dibêjin şoreş hat lidarxistin, ev fersendeke zêrîn bû ku ne tenê ji gelê Kurd re, lê ji hemû gelan re hat. Berdewamkirina şoreşê heta niha jî ji ber wê ye; ku rola gel her tim paşguhkirî bû, lê gel îro gihiştiye astekê ku nema qebûl dike dengê wan bê çewsandin û paşguhkirin. Êdî pêwîst e dengê gel di hemû qadan de bê bihîstin û bê dîtin. Lewra heta niha pevçûn berdewam dikin, ji ber ku dewlet radibin û dixwazin nakokiyên di navbera desthilatdariyê û gel de berdewam bimînin, da ku armancên xwe pêk bînin û serweriya xwe hîn bêtir li ser civakê saz bikin.”

### ‘Li hemberî navendîbûnê, dengê civakê bilind dibe’

Îlham Mihemed axaftina xwe wiha bidawî kir: “Ezmûna Rojava ya sîstema demokrasiyê, ji bo giştî pevçûnan çareserî bû. Lê ji ber ku ne di berjewendiya desthilatdaran de bû, êriş li ser hatin, xwestin wê ji kokê rakin û binpê bikin, ji ber ku sîstema demokratîk di xizmeta gel de bû, ne di xizmeta desthilatdaran de. Mînakê wê jî me li Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî dît, heta bi herêmên ji DAIŞ’ê hatibûn rizgarkirin û herêm bi giştî, xwestin têk bibin. Lê civak wê li ser şopa şehîdan dengê xwe bilind bike û li hemberî navendîbûnê bisekine. Civak wê bibêje: “Ez heme” û paşguhkirinê qebûl nake, ji ber ku çareserî hemû di sîstema demokrasiyê de ye, sîstemek ku rolê jinan, ciwanan, civakê, olan û hwd… hemû di nav de hebin.”


Kovan Keno

### ‘Pêwîst e em pirsgirêkên xwe beyî zextên hêzên navendî çareser bikin’

Kovan Keno da diyarkirin ku gelê Kurd ji sîstema navendî êşeke mezin dîtine û wiha got: “Di dema Baasê de, gelê Sûriyê bi giştî rastî siyaseteke herî nexweş hat, ji ber sîstema wê li ser qirkirin, kuştin û windakirina mafan ava bibû. Em gelê Kurd jî ji hemû pêkhateyên ku îro li Sûriyê dijîn, ji her kesî bêtir me êş kişandin. Em li ser axa xwe ya dîrokî bûn, lê bê maf û bê nasname bûn. Guhertinên demografîk li ser cih û warên Kurdan hatin kirin. Di demekê de li Qamişlo, 7 xortên Kurd silogana “Bijî biratiya Kurd û Ereb” hildan, yek ji wan birayê min Ekrem Keno bû. Ew silogan nehat qebûlkirin û ew 7 xort zêdeyî salek û sê mehan di zindanê de hatin hiştin. Ji ber ku di wê demê de siyaseteke navendî ya xwe disport “Yek alî, yek desthilatdar û yekrengî” hebû. Bi vî rengî zilim li ser hemû Sûriyê dihat kirin, lê bi taybetî li ser gelê Kurd. Piştî rûxandina wê rejîmê, em wekî Kurd dixwazin ku hemû pêkhate bi hev re alîkar bin, da ku Sûriyeke demokratîk, nenavendî û pirrengî were avakirin, Sûriyeke ku mafê hemû kesan tê de were parastin û bicihkirin. Siyaseta demokratîk ew e ku wekhevî û biratiyê pêk tîne. Ger ne bi vî rengî be, bi rastî jî krîz qet bi dawî nabe. Em dixwazin gelên Sûriyê, bi taybetî hêzên Kurdî, Erebî û hemû pêkhateyên din, bi hev re pirsgirêkên xwe çareser bikin, bêyî ku bandor an zexta hêzên biyanî li ser wan hebe.”

# Amerîka û Çînê; Têkilî û nakokî

Pêwendiyên di navbera DYA û Çînê de di gelek qonaxan re derbas bûne, di navbera hevkarî û dijatiyê de bi şêwazên cuda têkilî hatine guhertin. Ji bazirganiyê heta teknolojî û siyaseta navneteweyî her du welat ji bo serweriya cîhanê di nava pêşbaziyeke giran de ne.

**Şaho Xanim**

Ji salên 1970'an vir ve, têkiliyên DYA û Çînê di çend qonaxên aloz û hestyar e derbas bûne. Serokê berê yê DYA Nikson di sala 1972'an de serdana Çînê kir, li wir peymanek ji bo danûstandina têkiliyên dîplomatîk di navbera her du welatan de hat imzekirin û Çînê li şûna Taywanê kursiya daîmî di Konseya Ewlehiyê ya NY de girt. Di destpêka sala 1979'an de têkiliyên di navbera DYA û Çînê de baştir bû, bi taybet piştî ku Serokê DYA Yê wê demê Jimy Carter naskirina dîplomatîk ji Taywanê guherand bo Pekînê û siyaseta "Yek Çîn" qebûl kir. Serok DYA yê berê Clinton jî di dawiya salên 1990'î de di dema serokatiya xwe ya yekem de hevkariyek stratejîk bi Çînê re meşand, lê di dema serokatiya xwe ya duyem detêkiliyên bi Çînê re lawaz kir. Bi taybet piştî tomabakirina Çînê bi sîxurtiya leşkerî ya li dijî DYA û astengkirina tevlîbûna Çînê bo Rêxistina Bazirganiya Cîhanê û pêşketina têkiliyên DYA bi Taywanê re.

Di serdana yekem a Serokê berê yê DYA A 2009'an ji bo Çînê têkiliya herdu welatan ber bi hevkariyê ve çû, ber bi hevkarîyê ve çû. Lê ew têkilî nezelal bû, bi taybet piştî siyaseta Obama ya "ber bi Asyayê ve". Her du welat jî ji guhertina hevsengiya hêzê ditirsiyan û li gorî wê tevdigeriyan.

Di salên dawî de, bi taybetî bi hatina Trump re Çîn wekî rêkberê stratejîk hat destnîşankirin. Di dema kampanyaya xwe ya serokatiyê de, Trump soz da ku kêmasiya bazirganiya Amerîkî bi Çînê re kêm bike. Wî di 22'ê Adara 2018'an de dest bi bicihanîna vê sozê kir û bacên gumrikê li ser 200 milyar dolar derhatên Çînî yên bo Amerîkayê ferz kir. Çînê bi sepandina bacên gumrikê li ser 100 milyar dolar derhatên Amerîkî bersiv da. Lêbelê, di hevdîtinek di navbera serokên Amerîkî û Çînê de di civîna G20 de, wan li ser agirbesteke demkî ya sê mehan li hev kirin da ku rê bidin danûstandinên bazirganiyê. Her du aliyan piştre di 7ê Çileya 2019'an de danûstandin kirin ku bû sedema kêmkirina nakokiya bazirganiyê.

### Hêmanên hêza Amerîkî û Çînî

Guhertina hevsengiya hêzê di navbera Amerîka û Çînê de ji ber hêza zêde ya Çînê tê, ne ji ber lawazbûna Amerîkayê ye. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hêza pêşeng a cîhanê dimîne - ji hêla aborî û leşkerî ve, herwiha serdestiya wê ya siyasî hîn jî eşkere ye.

Lê Çîn jî hêdî hêdî lê bi bawerî ronesansa xwe ya modern ava kir, ceribandinek bêhempa li ser bingeha hevberkirina sîstemek "komunîst" ku ew pê ve girêdayî bû, bi sîstemek kapîtalîst ku vekirina deriyên wê ji bo veberhênanên gerdûnî pêwîst dikir, da meşandin. Vê yekê rê da Çînê ku ji hêza kar a erzan û jêhatî, hewildanên wê yên ji bo veguheztina teknolojiyên gerdûnî yên herî dawî sûd werbigire. Ev bi rêya hevberkirina sîstemek komunîst a navendî ya siyasî û sîstemek kapîtalîst a aborî ya azad an nîv-azad hate bidestxistin.


Ji aliyê leşkerî ve, Çîn budçeyek girîng ji bo pêşxistina şiyanên xwe vediqetîne û di cîhanê de di rêza çaremîn de ye. Ew xwediyê artêşa herî mezin a cîhanê ye, ku tê texmînkirin ku bi qasî 2.5 mîlyon leşkerên wê yên perwerdekirî hene.

Wek hêzek cîhanî ya geşbûyî, Çînê modelek hêzek cîhanî ya cuda ji ya Amerîkî ava kiriye, û hewl dide ku pergala navneteweyî ya yekçemserî veguherîne pirçemserî. Di vi re jî li pêş Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê tenê du vebijark hene; yan li hember dijberiya Çînê bisekine û hewl bide ku rewşa heyî li Asyayê biparêze, rola xwe ya serdest li Asyayê radestî hegemonya Çînê bike, an jî li lihevkirinekê bigere ku dihêle Çîn rolek mezintir bilîze û DYA hêza xwe biparêze.

### Fikarên her du welatan

Tevî girêdana aborî ya girîng di navbera her du welatan de, hêza Çînê ya zêde dibe fikarên Amerîkî gur dike û gelek pirsan li ser têkiliyên wan ên pêşerojê derdixe holê. Piştî hilweşîna Yekîtiya Sovyetê, di nav navendên ramanê yên Amerîkî de rêyeke bi bandor derket holê, ku bilindbûna Çînê bi gefê li ser serokatiya Amerîkî ya di rêza navneteweyî de girêdide. Vê rêyê ji bo rêveberiya Amerîkî gelek lêkolîn çêkirin ku wekî "teoriya gefa Çînê" tê zanîn, ku di du dehsalên borî de pir bi bandor bûye.

Li gorî vê teoriyê, Çîn ji ber şiyanên xwe yên aborî û leşkerî yên zêde dibe, bûye gefek ji bo berjewendiyên Amerîkî, bi taybetî li Asya û cîhanê. Nîqaşên Amerîkî



li ser rola girîng a Çînê li Asyayê disekinin û hin kes jî difikrin ku Çîn stratejiyek dişopîne ku li ser bingeha Doktrîna Monroe ya Amerîkî hatiye modelkirin, ku armanc dike Dewletên Yekbûyî ji peravên xwe dûr bixe, nemaze ji ber çalakiyên leşkerî yên Çînê li Deryaya Rojhilat û Başûrê Çînê. Ev yek bi hewldanên berdewam ên Çînê yên ji bo îlhaqkirina Taywanê, tevî parastina wê ya di bin sîwana Amerîkî de, tê tevlihevkirin.

Armancên berevaniya neteweyî û ewlehiya neteweyî yên rêveberiya Trump eşkere kirine ku rêveberiya wî li ser têkiliya xwe ya pêşerojê bi Çînê re dudilî ne û ji munafesa Çînê ji bo serkirdayetiya cîhanî ditirse.

### Pêşebazê û hevkariyê

Pêwendiyên DYA-Çînê di navbera pêşbazî û hevkariyê de diguherin, lê dînamîkên di navbera wan de ji nakokiya îdeolojîk a ku di Şerê Sar de di navbera blokên Rojhilat û Rojava de diyarker bû, cuda ne. Her çend gelek qadên pêşbaziyê hebin jî, têkoşîna ji bo serdestiya deryayî pir girîng e, Çîn budçeyek leşkerî ya mezin ji bo parastina sînorên xwe yên deryayî terxan dike. Ji sala 1949-an vir ve, Çîn kontrola xwe ya li ser giravên li Deryaya Başûrê Çînê ya navendî, hem li başûr û hem jî li rojhilat, didomîne, û rêyên avê yên li Deryaya Başûrê Çînê ya navendî bandorê li ser ji sedî 40 a bazirganiya cîhanî dikin. Ji ber vê yekê, Çîn dixwaze van rêyên avê kontrol bike, hem di çarçoveya nakokiya xwe ya bazirganî bi DYA re û hem jî di çarçoveya berfirehtir a pêşbaziya bazirganî ya ku hilberên Çînî pê re rû bi rû dimînin.

Pêwendiya DYAyê bi Taywanê re pêşketiye. Di 16ê Adara 2018an de, Serok Trump Qanûna geştyariya Taywanê îmze kir, ku serdanên fermî yên dualî teşwîq dike. Çînê ev qanûn wekî binpêkirina siyaseta "Yek Çîn" ku bi rêveberiyên berê yên DYAyê re li hev kiribû, nirxand. Rêveberiya Trump firotina çekên pêşketî ji Taywanê re, tevî parçeyên yedek ji bo balafirên şer ên F-16, pejirand. Wekî din, Cotmeha borî, DYAyê du keştîyên şer ji Tengava Taywanê re şandin. Di 1'ê Çileya 2019'an deTrump Qanûna Înîsiyatîfa Piştrastkirina Asyayê îmze kir, ku pabendbûna DYA'yê ji bo ewlehiya hevalbendên xwe yên Asyayî, tevî Taywanê, ji nû ve piştrast dike. Ev kiryarên DYAyê bê guman dê têkiliyên DYA-Çînê bêtir aloz bikin.

Pirsa sereke xuya dike ku gelo Çîn dê hebûna leşkerî ya berfireh a Amerîkî li Rojhilatê Asyayê tehemûl bike, an jî dê hewl bide ku hevpeymaniyên Amerîkî bi Japonya û Koreya Başûr re qels bike, bi vî rengî Amerîka neçar bike ku ji destwerdana leşkerî di karûbarên Asyayî de dûr bisekine. Bandora Çînê li ser Koreya Bakur, bi rêya rola wê ya avaker di pêşîgirtina li belavbûna nukleerî li Nîvgirava Koreyê de, dibe ku yek ji rêyên gihîştina vê armancê be.

Di her rewşê de, ev tevliheviya pêşbazî û hevkariyê ji du hêzên global ên ku berjewendiyên wan ji hev cuda ne, lê di heman demê de bi hev ve girêdayî ne jî, tê hêvîkirin. Lêbelê, cudabûna eşkere di nirxên wan ên siyasî de rewşek tevlihev afirandiye: ku bi hevkariya aborî ve girêdayî ye.

### Rojhilata Navîn

Mezinbûna berdewam a Çînê bi pêşbaziya bi Dewletên Yekbûyî re di gelek astan û warên cûrbecûr de re hatiye. Têkiliyên xwe yên siyasî û çalakiyên xwe yên aborî bi gelek welatên Rojhilata Navîn re berfireh kiriye, di nav de firotina çekan ji Îran, Erebistana Siûdî û yên din re. Herwiha ew hewl dide ku hebûna xwe ya deryayî li herêmê berfireh bike wekî beşek ji tiştê ku ew jê re dibêje "stratejiya parastina deryaya dûr". Her çend ew bê guman niyeta wê tune ku bi Dewletên Yekbûyî re di herêmê de pêşbaziya leşkerî bike jî, ev yek rê li ber wê yekê nagire ku ew bûye lîstikvanek navneteweyî ya nû li Rojhilata Navîn. Û her ku Çîn bêtir xwe dispêre petrola herêmê, ewqas bêtir biryardar dibe ku rê li ber Dewletên Yekbûyî bigire ku kontrola yekane li ser dewlemendiya petrola Kendavê hebe.

### Serdana Trump ji Çînê re

Piştî civîna lûtkeya di navbera Serokê Amerîkayê Donald Trump û serokê Çînî Xi Jinping li Pekînê, têkiliyên Çîn-Amerîkî niha di qonaxek aramiya dîplomatîk û sekinandinê de li ser mijarên nakok re derbas dibin. Tevî ku her du alî jî danûstandinan wekî "erênî û avaker" bi nav kirin jî, ew bêyî ragihandina ti rêkeftinên girîng bi dawî bû.



# Vayrûsa Ebola: Belavbûn, sedem û xweparastin

Vayrûsa Ebola di Adara 2014'an de li Rojavayê Afrîqayê dest pê kir û wekî mezintirîn pandamiya xwînçûna vayrûsî di dîrokê de tê dîtin. Ew bandorê li mirov û lawirên weke meymûnan dike û rêjeya mirina nexweşên wê ji sedî 40 e û ihtîmale ku bighêje 50'î.

**Aryen Hesen**

Vayrûsa Ebola nexweşiyeke giran û pir caran kujer e ku ji ber tayê û xwînçûna hundirîn û derveyî çêdibe. Dema ku li seranserê laş belav dibe, zirarê dide pergala parastinê û lebatê laş dibe sedema xwînçûna bêkontrol.

### Vayrûsa Ebola mezintirîn vayrûsa di dîrokê de tê dîtin

Vayrûsa Ebola di Adara 2014'an de li Rojavayê Afrîqayê dest pê kir û wekî mezintirîn pandamiya Xwînçûna Veyrûsa di dîrokê de tê dîtin. Ev veyrûs nîşaneyên wê di navbera ji 2 heta 21 rojan tê diguhertin û di nav 8 heta 10 rojan de xuya dike.

### Nîşanên Destpêkê yên veyrûsa Ebola wiha ye:

Ta û bilindbûna germanhiya laş – Ricifandin - Serêşeke giran - Êşa qirikê - Êşa masûlkeyan- Êşa movikan - Lawaziya laş – Westandin - Pizika çerm - Êşa zik an gede - Dilneçûna xwarinê – Navçûn – Verişîn

### Nîşaneyên Dereng ên derketina veyrûsa Ebola

Xwînçûna ji dev - Xwînçûna ji roviyan - Xwînçûna ji çav, guh û poz - Têkçûna pergalên lebatî.
Girînge ku were zanîn eger kesek piştî 21 rojan ev nîşane lê nehatin xuyakirin, îhtîmaleke mezin ku ew nexweş neketibe.

### Bihêsanî nayê veguhestin

Veyrûsa Ebolayê bi gelemperî bi hêsanî wekî nexweşiyên din nayê veguhestin, ji ber ku kesek bi veyrûsa Ebolayê vegirtî nikare nexweşiyê belav bike heya ku nîşanên nexweşiyê xuya nebin.

### Lê belê nexweşî dikare bi rêbazên jêrîn di navbera mirovan de were veguhestin:

Mîz - Pîsî – Xwedan – Girêz – Verişîn - Hêstir
Veyrûs dikare heta du hefteyan di şîrê dayikê de bimîne, ji ber vê yekê divê jinên bi Veyrûs Ebola di wê dema de şîrdanê bisekinînin. Dibe ku mêr Veyrûs Ebola ji 3 heta 9 mehan bigirin. Ji ber vê yekê jî divê ku mêr ji kesên nexwaş û Veyrûs bi wan re heye dûrbikevin û têkilî çênebin.



Herwiha Veyrûs dikare bi rêya birînên di çerm de an jî bi rêya poz, dev û çavan jî derbasî hundirî laşê mirov bibe.

### Rêyên ku veyrûs tê re derbas dibe

Veyrûsa Ebola dikare bi rêya têkiliya bi rû an nêzîbûna laşê kesekî vegirtî belav bibe weke: Bikaranîna çarşefên hev - Cil - Derzî û siring - Amûrên bijîşkî

### Wergitina veyrûsê bi rêya lawiran

Li Afrîkayê, veyrûs Ebola bi rêya têkiliya bi lawiranên kovî yên vegirtî ku çûne ser xwîna lawirên din yên nexweş belav dibe.
Girîng e ku were zanîn Veyrûs Ebola bi gelemperî bi rêya av, hewa, xwarin an jî kêzikan wekî mêşan belav nabe.

### Aloziyên veyrûs Ebolayê wiha ne:

Di nav aloziyên demdirêj ên herî berbiçav ên veyrûs Ebolayê de pirsgirêkên dîtinê û êşa movikan e. Carinan zehmet dibe ku mirov diyar bike kesek veyrûs Ebolayê girtiya an na, lê dibe ku bijîşk hin ezmûnan bike da ku nexweşiyên din, wek kolera an malarya red bike.

### Testên jêrîn jî dikarin ji bo tespîtkirina veyrûs Ebolayê werin bikaranîn:

Testên xwîn û tevnan: ji bo tespîtkirina Veyrûs Ebola ye.
-Têsta (Polymerase chain reaction PCR) ji bo tespîtkirina hejmareke piçûk a perçeyên veyrûsê di astek piçûk ên xwînê de. Ev test bêbandor e dema ku veyrûsê bi hejmareke mezin di xwîna nexweş de hebe.
- Têsta Antibody capture enzyme linked immunosorbent assay-ELISA.
- Tîsta Antigen capture detection tests.
- Têsta Serum neutralization test.
-Testên bi rêya mîkroskopiya elektronî.
-Veqetandina veyrûsê bi rêya çandina şaneyan.

### Dermankirina veyrûsa Ebola

Niha ji bo veyrûsê ebolayê dermanek misoger nehatiye zanîn. Her çendî hin cûreyên dermanan hatine cerbandin lê yek ji wan bi awayekî gîştî nehat bikaranîn, eger ku ew derman başe an na. Di sala 2020'an de, ji aliyê desteya tenduristî a cîhanî hate erêkirin ku sê cûreyên dermanên (Atoltivimab) (Maftivimab) (Odesivimab-ebgn) ji bo veyrûsa ebola were bikaranîn. Bi gelemperî, divê ku nexweşê ku bi veyrûsa ebola ketî, derbasî nexwaşxaneyê bibe û bijîşk ji wan meyze bike û testan ji wan çêbike û ji bo bidestxistina hin baldariyên tenduristî yên weke;
Sîromên damarî – Oksîjen - Kontrolkirina tansiyona xwînê -Dermankirina her enfeksiyonên ku nexwaş êşê jê dikşîne - Veguheztina xwînê. Bersiva nexweş ji bo dermankirinê bi bersivdayîna pergala wan a parastinê ve girêdayî ye. Kesên ku ji Ebolayê sax dimînin 10 sal an jî zêdetir divê ku parastina xwe bikin.

### Xweparstina ji veyrûsa Ebola wiha ye:

Vaksîyonek ji bo pêşîgirtina li veyrûsa Ebolayê heye, ji ber vê yekê jî pêwîste kesên ku li welatê wan xeteriya belavkirina veyrûsa ebola heya an jî diçin welatên din, divê ku vakslêdanê bistînin.
Destên xwe bi awyekî baş bi sabûn û avê bişon û paqijkerên destan ên li ser bingeha elkihol bikar bînin. Herwiha nabe ku destê xwe bi xwînê bike, ji kesan dûr bisekinin, nebikaranîna cilên hev, dext an çarşefê hev, derzî û alavên bijîşkî yên ku dikare bi rêra wê re veyrûsa derbasî laşa mirov bibe bikarnînin. Ji kesên ku nîşanên wekî ta anjî vereşînê lê xuya dike dûr bisekinin. Çêtir e ku merov ji merasîmên cenaze an veşartina kesên ku ji ber veyrûsa Ebolayê mirine dûr bisekine.
Pêwîste ku destê xwe bi xwîn, goşt û lawiran nekin.
Çêtir e ku mirov neçe nexweşxaneyên li Afrîkaya Rojava yên ku nexweşên bi veyrûsa Ebolayê lê têne dermankirin. Herwiha pêwîste ku piştî vegera 21 rojan ji welatek din tenduristiya xwe bişopînin û heke nîşaneyên veyrûsê xuya bikin, bijîşkan hişyar bikin.

### Tedbîrgirtina bijîşk û kesên ku di warê renduristinê de kar dikin

Ji bo karmendên tenduristiyê yên ku têkiliyê wan bi kesên veyrûsa Ebola bi wan re heye re rû bi rû mane, divê gavên jêrîn pêk bînin: Amûrên parastina kesane, di nav de cilên parastinê, lepik û amûrên parastina çavan li xwe bikin.
Nexwaşên ku veyrûsa Ebola bi wan re heye ji nexwaşên din cûda bikin.
Ji kesên ku bi sedema veyrûsa abola mirine û anjî kesên ku berê bi nexwaş re bûn dûrbikevin.
Di heman demê de divê ku agahiyên lezgîn derbarê nexwaşên bi veyrûsa ebola ketine werin dayîn da ku karmendên tenduristiyê tedbîrên xwe bigirin.

### Li hin welatan hişyarî û tedbîrgirtina ji belavbûna veyrûsa ebola weke:

Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO), têkildarê şewba Ebolayê ku li Komara Demokratîk a Kongoyê ji ber varyanta Bundibugyo rû daye û dermanê wê tune ye, "rewşa awarte ya tenduristiyê ya navneteweyî' îlan kir.
Herwiha li Misirê jî tedbîr ji bo belavbûna veyrûsa ebolayî tê girtin. Li gelek welatên din hişyarî û tedbîr ji bo welatiyan tên dayîn û rewşa awarte tê îlan kirirn.



Hafiz Ahmet Turhalli

## Cejna Heciyan û pirsgirêka qurbanan

Cejn ji bo kêfxweşî, parvekirin û serkeftinan tên pîrozkirin! Li hemû cîhana Îslamî, bi navê ola Îslamê, du cejn hene. Yek bi navê cejna Remezanê ye, ya dîtir jî cejna Qurbanê ye. Cejna Qurbanê li gel milletê Kurd, weke cejna Heciyan tê binavkirin. Serîde milletê Ereb û Misilmanên dîtir vê cejnê, weke cejna Qurbanê bi nav dikin. Divê gotin li gor naverokê were bikaranîn. Ger gotin ligor naveroka rast neyên bicîhkirin, wê demê hemû tişt dê were berovajîkirin. Bi taybet gotinên jiyanî yên baweriyê girîngin! Gotin rast bin, dê jiyanjî rast were jiyîn. Bawermend karibin baweriya xwe li ser bingehekî rast fêr bibin, ew ê dinya û axreta xwe de jî bi aramî û huzur bijîn. Pêkanîna kiryaran bi gotin û naverokên wan ve raste rast girêdayî ne. Bandora gotinê li ser kesayet û civakê rola sereke ava dike. Gotin rast neyên bicîhkirin tevlîhevî û ji armanc durketin çêdibe.
Pirsgirêka gellekî Misilmanan ya sereke ewe kû girêdana wan ji bingehên baweriyê zêdetir, girêdana bi hawîrdor û hêza desthelatê ye. Ji ber wê girêdana hêza madî, nêzikbûna wan ya pirsgirêkan jî çavkaniya xwe dibe madî. Wateya gotina Qurban; ji bingeha "qurb" ê tê û wateya xwe nêzkirin, nêzikbûn, bi wateya olî; kesayet xwe nêzî Xwedê dike, xwe radestî îradeya Afirîner dike, girêdana xwe bi wê îradêve misoger dike, hizr û ramana xwe ava dike. Li gor wê baweriyê jiyana xwe ava dike. Ev bîr û bawerî wê kesayetêde kemaletê têgîhaştinek rast ava dike. Qurban wateya, nêzikbuna Xwedê, fedakarî, sipas û hemd jibo Afirîner, hevkarî û alîkariya bi muhtacanraye, lê roja îroyin buye xwe nîşandan û quretiya ser civakê.
Navê herî rast, Kurd li vê cejnê dikin. Weke cejna heciyan binav dikin. Di rastiyê de ev dema ku Misilman hemû dicivin, weke kesayet xwe paqij dikin û divê paqijiya ruhî u laşîde serdekievin. Piştî vê destkeftên manewî û madî cejna Heciyan pîroz dikin.
Di cejna Hecîyande, ji çar hêlê cîhanê bawermendên Ola Îslamê diçine Mekê li ser girê Erefatê dicivin, hemu Îhramê lixwe dikin, cudabunên weke dewlemend û feqîr, zana û nezan, jin û mêr, leşker û serleşker, reş û sipî, Ereb û ne Ereb hemû dibine yek tişt. Bi vê kiryarê Xwedê dixwaze ji mirovanre bêje hun hemû di mafên xwede weke hevdune. Raste li gor taybetmendîyên we kar û tevgerên we cudane lê hun weke hevin. Ji hev ne zêde, nejî kêmin. Li girê Erefatê piştî ku mirin tê bîra mirov, ji bo wekhevî û edaletê erk li mirov tên siwarkirin. Divê her bawermendekî Îslamê, ji bo wekhevî û edaletê têbikoşe û alkarîya bindestan û muhtacan ji xwe re bike felsefeya jiyanê.
Kevirkirina Îblîs jî wateya durketina ji nebaşiyane. Weke zilmê, derew, fesadî, paşgotin, mafê xelkê xwarin, xerakirin û çavsoriyê.
Bi gotinekî em karin bêjin, Hec Kongreya hemû Misilmanan e, ji bo ku hevkariya hevdu bikin, li hev xwedî derkevin, pêşî li zilm û nebaşiyan bigrin.
Em dibînin Ereban û yên din navê vê cejnê danîne cajna Qurbanan û divê cejnêde bi milyonan heywanan serjêdikin. Zilma li Erdnîgariya wan pêk tê nabînin, hêjî xwîna mirovan bila sedem dirijînîn, mal û hebuna xelkê bi xapandinê ji wan distînin.
Pêwiste cejna heciyan, ji bo rakirina zilma ser mezlûman û bi dawî anîna feqîrêyê bihata pîroz kirin.
Cejna Heciyan li gelê me û Misilmanên rast pîrozbe.